Gilgamêş

Kurteromaneke efsaneyî

Cankurd

2008

PÊŞGOTIN

Belê rast e ku her kes dibêje *"Çi hebû û çi tune bû..."*, lê kes nabêje "Ka **Enmêkar**ê paşayê bajarê **Urûk**ê çi kiribû û çi nekiribû?"

Emnêkar Paşa, her wekî toreya Ereban, dema keçek nû dihat gêtiyê, ew bi saxîtî dida binaxkirin.

Lê ew kiryarên derdemî, ji kesî re nadomînin. Lewra **Îzed**ê bexşende zagona xwe ya xwezayî ji kesî nahêvişîne. Pir kesên cewrkar ên jirêderketî, yan li riya rast vedigerîne, weyaxud wan serobin dike û diveçirîne. Lê ev pîroziya ku jê re *qeder* tê gotin, her li rasteriya xwe didomîne û gelek caran bi firr û perwazên bazê çanda kurdewariyê, vîn û daxwaza mirovanvediguhêze ser tewrê evîn û vînheziyê...

Emnêkar Paşa çi dizanibû ku wê ev zarûkekî şîrmij ê ku di nava penceyên Bazê wekheviyê de, navê Gilgamêş werbigire û piştre jî li şûna wî bibe paşa, rê li xiraban û xirabiyê rade?

Di wan deman de şêr, gur, keftan û piling li derdora bajarê **Urûk**ê pir hebûn, lê pirê wan yên dunig bûn; ji xwînheramîyê bigir heta cewrkariyê, hemû cûreyên xirabiyê tê de kame û serqûç kiribûn.

Erê dibêjin ku **Gilgamêş** paşa bû, lê xweşpaşa bû! Bejna wî jî temam bû. Di xewna wî de kevir li ser bajarê **Urûk**ê dibariyan. Hêza wî eman bû, leşkerên wî wek tofan bû, paşatiya wî li bajarê **Ûrik**ê her diçû kame temam dibû. Jixwe bedena li dorê jî, pir aram bû.

Gilgamêş ketibû nava tevger û livanekê, dixwest ku wekhevîtiya dadetiyê li welatê xwe ava bikira, lê çare û mikana wî ji destên xirab û kambaxiyan nebû. Li ser gotina **Urşanav**ê hunerdar, ber bi bakûr ve çû, heta xwe bera nêv ava çemê **Ava Şîn** da û gula çandewariyê derxist ku bi vîn û ramana wê, li dinyayê bibe nûcuwan û tazejiyan. Lê mixabin civata maran ew fersend nedanê...

Erê rast e, **Çemê Aveşîn**ê ku niha jê re **Ava Şîn** tê gotin ku li başûrê welatê nivîskarê vê destanê ye, niha jî, ew jîn û jiyanê dide mirovan û mirovatiyê daye gêtiyê, herweha hemêza xwe ji cihana medenî re jî vekiriye...

Çendî ku marê kor ê qertîşî xap û dek li Gilgamêş kirin, dolab lê gerandin û nehêla ku derfet bo wî derkevin, lê Yezdanê bexşende derfet û merc bo wî afirandin. Erê rast e ku jiyan û cuwanî nebûn para vî, lê bajarê Urûkê wek diyarî bû yê wî; pê şan û şanaziya wî giha ber serokatiya mêjû û ji jar û belengazan re bû hefad û xweşmêrê demê.

Gilgamêş ne peyamber bûye, lê xewn û ramanên wî wek îlham û kerametan bûne. Ji ber ku wî ne tenê mirovên zorkar, lê teba û dabeyên xwînxwar jî dixistin riya êminatiyê, yan jî xatirxwestina wan ji jiyanê dida kirin. Herweha wî parastina xwezayê jî, kiribû berpirsyariya sereke û dida hêwirandin.

Gilgamêş pênc hezar sal berê, parastin û êminatiyê dida kirin. Ne tenê bajarê xwe, lê piraniya herêmên Rojhilata Navîn jî dihêvişand. Heta ku li keviya deryaya **Uman**ê, li ser axa vî welatê **Dubai**ya ku niha bi kevirên sedef dewlemendiya xwe bala kiriye, keleh û kolan avakirine, merc û tewrên jiyana hemwelatiyan sererast kiriye û wekhevîtiyê aram kiriye...

Dema ev çîroka efsaneyî ya Gilgamêş di ber hizr û bînahiya mirovî re derbas dibe, mirov dibê herwekî ku ev çûrokên **Folklora Kurdî** yên kevnbare ne û wek naveroka çîroka ABIDÊ ŞIKEFTÊ, ya KALÊ MERIVXWUR, ya ŞAHÊ MARAN û gelekên wisa yên din...

Gilgamêş Paşa gotiye: *"Ez ê bi zora baweriya xwe ji tariyê derbas bim û ez ê bi hişmendiya xwe jî bigîjim armanca xwe."*

Ez bi umîd im ku ziman û çanda kurdî jî, di demeke nêz de, ha bi xebatên wisa, bi nivîsandina destanên wisa, wê zorî bide tarîtiyê û jê derbas bibe, bi hişmendiya rewşenbîrên Kurd jî wê zûtirîn dem bigîjin armanca xwe.

Ji birayê hêja Can Kurd re serkeftin dixwazim û Destana Gilgamêş li pirtûkxaneya Kurdistanê pîroz be.

Stockholm 2008. 12. 02, saet 03.45

Zeynelabidîn Zinar

I

Çi hebû, çi tune bû…

Dibêjin, ku berê pir ji zû ve, li bajêrê Urûk, ê ku dikete jêriya Babil, padişahekî zor bi hêz ê bi navê Enmêkar hebû û deselata xwe li ser bajêrê pir şên û fireh bi rê ve dibir. Di nav gelê wî de bi sedan mişextiyên ku ji ber cengan reviyane, tev li zarok û seg û pezê xwe dijiyan.

Rojekê ji rojan, gava şah Enmêkar hatibû perestgehê, da qurbaniyeka xwe bo pût û hîman bide, jineka sihirbaz û fêlbaz, ku bi dexsîniyê dilê wê dagirtî bû, û ji ber xeyd û nevîna di sîngê wê de dikeliya, di nav pût û hîmên girs û tirsavêj re, ber bi wî ve hat û got:

"- Heger jina te dotekê ji te re bîne, û ew jî kurekî bîne, ewê hêza te dagerîne, text û taca te bistîne û deselata te biherifîne."

Şah pir tirsiya, bi zûkî vegeriya koçka xwe, û bi çavin tijî xem li dangê jina xwe nêriya, dît ku hemahema neh mehên wê teva dibin. Şahbanoya ku ji awirên wî yên wekî yên marekî xuya dibûn vecinixî, destekî xwe da ser dangê xwe yê giran, rûyê xwe ji wî guhart û bi hindirê paşmaxeke tarî de çû, weku mirovê tiştekî xwe yê pir biha ji ber çavan veşêre.

Xwedê kir, şahbanoya bi du canan barê xwe danî û ji mêrê xwe re dotek anî…!

Şah Enmêkar bi wê yekê tew dilşad nebû, bi çeplê dota xwe girt û ji zarotiyê de xiste burcekê, da kesek wê nebîne, bi ber çavên şehzade û sersuwar û cengewaran nekeve… da kesek destê wê ji wî nexwaze û ew keç nebe bûka hîç mêrekî… Divê ji wê dotê zarok nebin, divê ew tew nebe jin.

Roj li pey rojê, û şev li pey şevê, hatin û çûn…

Dota Şah Enmêkar di burcê de mezin bû, gihaşt û gelek xweşik û mêşeng bû. Her roj û her şev di tenahiya burcê de, bi firind û kêrguh û çêlçûkên tawûsan re…

Xwedêyo, girtin û destegîrkirina mirovan çiqas tehl û naxweş e…!

Ji dergevan û peyayên ku pawaniya burca wê dikirin, wê hîç mirovek nedidît, û wê tew nedizanî, ka dayikek wê li ser rûyê zevînê heye, an jî xang û birayek…

Dilê wê kete peyayekî ciwanmêr. Ew peya bi şev dibû dergevanê koçka wê, û bi zûkî di navbera wî û keçikê de hevnasî û hezkirin pêda bû. Keçik nezan bû û ew ciwanmêrekî

mêhez bû, carekê li wê ket, û nema keçik ji wî vedibe, hercar gava ew dibû dergevanê wê, bi lez û bez dikete razanga wê û bi wê re diraza… keçikê ji wî girt û avis bû, bi du canan bû…

Peyrew û peyayên, ku pawanî û dergevanî bo dota şah di wê burcê de dikirin gelek tirsiyan, ku şah seriyên wan bibirre, gotina xwe kirin yek gotin, û piçûkê dota şah, neviyê wî yê hîn mindal bû û tew rohniya royê bi çavan nedîtibû ji dayika wî diziyan û yekser ji ser surha kelehê ve avêtin xarê… Surha kelehê bilind bû, û bayê wê rojê bi hêz bû…

Erê, mirov karê xwe dike, çi baş û çi nebaş, hema Qeder li ser rêya xwe ye, û gelek caran tersî daxwaz û viyana mirovî ye.

Gava ew mindal ji surhê ve hatiye avêtin, ew bi ber çavên bazekî ket, baz yekser xwe ji taqên bilind ên burceke dî ve bi ser wan hovan ve berda, basikên xwe yê pir mezin û jihevkirî hejandin, ew mindal li banî girt û bi asîmanê ve rakir û dûr bir, revand…

Gelek tîr û rum li pey wî hatin avêtin, hema tirsa wî ji nêçîrê tune bû, lora ku ew bi xwe nêçîrvan bû, nêçîrvanê asîmanî bû, kêra Qederê bû, ku bi xebatê paşeroja şahdariyekê, neteweyekê û nîştekî fireh û xudan şaristanî guhart.

Baz ew mindal bir li nav baxekî pir bi dar danî, dîsa basikên xwe li hev xistin û di asîmanê bilind û fireh ra, bi hêz û bi xwe bawer, û di dil de pesindariya serkeftineke pehlewanî pêdabûyî, firiya…

Li ser rûyê zevînê, ku mirov êdî wekî gêre û mêşan piçûk dixuyan, gelekan destêd xwe di ser çavêd xwe re girti bûn, da di nav pertav û tîrêjên royek bi hêz re li fîra wî ya şahanî bikin, û keseran bikişînin û bo xwe bêjin:" Bo çi em jî nikanin wekî vî bazî bifirin, ji van kul û janan azad bibin…?"

Xudanê wî baxî, ku mindalê tazî dîtiye, bi lez û bez ew xiste nav kurkekî, ku di xanîkê wî de bû, û yekser navê wî lêkir: Gilgamêş. Mindal law bû û navê Gilgamêş navekî xweşik bû.

Dem û salbirrk derbas bûn. Gilgamêş bû mêrekî hêzdar, deselat ji destê daybavê xwe stand, û wilo qedera ku daybav jê tirsiya bû, bi cîh hat, çare û derman bo rêgirtinê li Qederê tune bûn…

Mirovan berê bawer dikirin, ku pir xuda hene ne yek. Wan bawer dikir, ku ro xudayeke û navê Şamş lêkiri bûn. Wan di royê de hêz û mêranî didîtin. Di bad û bahozê de lehengî didîtin û lew re navê Adax lêkiribûn.

Gilgamêş hem bi hêz bû û hem jî mêrekî wêrek bû. Dibêjin ku ew yanzdeh piyan dirêj û sîngê wî nehbostî bû… Ew qanat û li ser xwe bû, her roj dadiket nav bajêrê Urûk û bi xelkê re dikete pevçûnê. Kesekî ji mêr û jinan nedikanî zora wî bibe û her hezdikir zora mêran bibe, weku kesekî pir hezkiriyê deselatê dihate dîtin, û ji tirsa re mirovan bawer dikirin, ku du parên wî xudayî ne û parê sêyemîn jî mirovî ye… Lê gilî û gazincên xwe jî dikirin û

digotin, ku Gilgamêş nahêle ciwanekî bajêrê Urûk bi mirazê xwe dilxweş bibe, bibe mêrê bûka xwe, an jî bibe bavê kurê xwe, wan yekûyek binve dike û tune dike, êdî ew şivanê pez û lawikê li çolê mezin bûye, bûye ciyê daxa dilê gel, hema kesek nikane xwe ji wî bi hêztir, zanatir û hişmendtir bide nasîn û navkirin, ew serbaşê tevan bû, pêşmêr û serkêşê lawan bû.

Gilgamêş, ê ku deselat bi zorbazî xisti bû destên xwe, ferman da; di dora bajêrê Urûk re surheke bilind û qaling û pir mekin bite avakirin, û ji hemî gelê xwe xwast, ku di karê avakirinê de kar bike û bixebite. Gel her roj, di bin lêdana qamçeyan de ew surh ava kir, lê gelek kes jî, bi taybet ên jar û pîr ji ber zorbaziya Gilgamêş û peyrewên wî mirin. Gilgamêş ew surh ava kir, da çi padişah û şehzade yên biyanî nikanibin zora wî bibin û bajêrê Urûk ji nav lepên wî derxînin. Wilo jî ewê kanibe her û her deselata xwe ya xûnî bigudîne. Ji xwe wî bawer dikir, ku ewê herheyî bijî.

Efsane dibêje, ku xudayên baweriya gelê Urûk pê dihat, tev li hev civiyan û ji hev gilî û gazinc kirin. Dawî gotine xudîka deselatdariyê Anû:

"- Te ev Gilgamêş ê serhişk û zorbaz pêda kir, ewê ku niha şivanê pezê Urûk e, lê zora xwe li hemî ciwanên bajêr dike. Divê tu tiştekî bikî, da zora wî kêm bibe."

Anû jî deng li Arûro kir, ku hêza wê ji ar 'agir' û ji royê bû, gotê:

"-Te Gilgamêş pêda kir. Niha jî tuyê yekî wekî wî pêda bikî, bila tengdar û beraberê wî be, da bi hev biçin û zora hevdu bibin, gel wê ji zorbaziya Gilgamêş vehese, û bajêrê Urûk ji vê tengiyê azad bibe."

(II)

Arûro gotina Anû yekser bi cîh anî, û lehengê mezin Enkîdo, peyamnêrê xudîkan, ji tunehiyê, ji Nînûrta "nistina şevê" pêda kir û hêzek bêwekanî dayê.

Enkîdo bi gelek por û birç bû, teviya govdeyê wî bi pirçê hatibû pêçan, hevdeyên porê wî jî wekî yên xudîka dexl û geniman direj û zirav bû, û bi wê yekê mîna Zûmûkan, xudîkê cinaweran dixuya.

Enkîdo mirov nedinasîn, ji ber ku ew li çolê, bi cinaweran re mezin bû, bi wan re geya dixwar, ji avên cobara û kaniyan vedixwar, bi wan re hem dilîst û hem jî dikete pevçûnê,

qutê dikir û gava cinawerek gêrdikir, ew li ser zikê wî rûdinişt û hinavên wî diçirandin, wekî gurekî an şêrekî dixwar. Cinawer ji wî ditirsiyan, hema ji wî hezdikirin, bi pey wî diketin û li gor daxwaza dilê wî diçûn û dihatin, bi wî re dilsoz û wefadar bûn, ji ber ku ew di nav wan de pir dadmend bû…

Teviya wan cinaweran dizanîn, ku Enkîdo ne kesekî wekî wan e, ew ji wan cihê ye, li ser du pêyan digere û pir jîr û çalak û zanatir e ji wan. Enkîdo jî bê cinaweran nema dikanî bijî, di nav wan de û bi wan bûbû xudanê hêzek mezin, bê wan ew bêhêz dibû, jar û dilxem dibû.

Rojek ji rojan ciwanmêrek ji mala xwe derket, çû nêçîrê li çolê bike, dava xwe ya mezin li ber devê kaniyekê di binê hinek zinaran de vena, û xwe di êvsîneke ji pîkin û pelên daran de veşart, da cinawer gava bên ser avê wî nebînin û nerevin. Çi bibîne? Keriyek ji asik û pezkoviyan ji wê ve, li pey mirovekî wekî cinaweran şilf tazî, lê pir bi por û pirç, di pêşiya wan de, ji nav daristanê derket, bi ser kaniya avê de hat. Cinawerê wekî mêrekî qanat dava ku li ber avê vegirtî bû dît, hema yekser beziya ser wê, rahişte wê û bi asanî tev çirand, ji hev kerker kir, bê kêr û bê şûr…

Enkîdo rawestiya te giş asik û pezkoviyan av vexwarin, dawî wî jî xwe li ser zik avête ser zevînê, têr ava sar vexwar, rabû, carekê li dora xwe nêriya, guhên xwe bel kirin û çavêd xwe beq kirin, da tiştekî, neyarekî bibihîse an bibîne, lê ji xulxula avê di coyê re û ji wîçewîça firind û tilûran çi dengên nenas nehatin guhên wî û ji livîna pîkinên daran, ku tîrêjên royê di nav re xwe berdidan xarê, tiştekî berê nedîtî bi ber çavan neket. Li pey pezê xwe bi nav daristanê ve çû, winda bû…

Nêçîrvanê matmayî maye û tirsek mezin dilê wî girtibû, bihnek kûr û dirêj li bayê xist, û bi lez û bez ji wir baz da, reviya çû mala xwe. Li mal gote bavê xwe:

"- Bavo, Bavo… Min li çiya û baniya mêrekî hov dît, ku kesekî wekî wî hêzdar û qanat ta niha bi ber çavên min neketiye. Ew tev bi por û pirç, wekî cinaweran bû, li pey wî keriyekî pezkovî û asikan hate ser ava kaniya Avsarkê, ku min li wir dava xwe vegirtibû…" û çêroka xwe ji bavê xwe re bire serî, û li dawî got:

"- Bavo, li min biborîne, min şe nekir, ku derkevime hember wî hovemêrî…"

Bavê wî bi nermî bersîva wî da:

"Kurê min î nezan, li bajêrê me Urûk destek di ser destê Gilgamêş re nîne, ta niha kesekî ji mêr û jinan zora wî nebiriye, ta niha kesekî şe nekiriye, ku qerezê ji Gilgamêş bixwaze… Hêza wî wekî ya gombeta asîmanî ye, here ba wî, ji wî re çêroka wî hovemêrî, wî cinawerî, bîne zimên, bila ew keçekê bide te, wê keçê bi xwe re bibe, bila ew li nav daristanê bigere, dibe ku bi ber çavên wî cinawerî keve, ew bi pey keçikê keve û ji heval û hogirên xwe yên çolê verê bibe, ewê pişt re bi zûkî jar bibe û bikeve davên te, tu yê wî bigirî û bo min bînî."

Nêçîrvan bi gotina bavê xwe kir, rabû çû ba Gilgamêş û gote wî:

"- Gilgamêş ê navbilind û hêzdar, xudanê surha qaling û pêşmêrê Urûkê, min hovemêrek li daristanê dît, ku wekî wî bi hêz min di jîna xwe de mirov nedîtine, ew bi cinaweran re dijî, gelek bi por û pirç e, cinawer tev li pey wî digerin, û wekî ew dixwaze dikin. Min li ber kaniyekê dav vegirtin û xefk çêkirin, wî xefkên min herifandin û dava min bi destan çirand... Ez çi bikim?"

Gilgamêş pirsiya:

"- Tu çi ji min dixwazî?"

„-Tu yê keçikekê bidî min, ez ê wê ji hovemêrê daristanê re bikim xefk û dav."

„- De bila...vane ji te re çar Penes, here jineka ciwan ji nav cariyên perestgehê, ku bi hunera ji rê êxistina mêran jîr e, bi xwe re bibe, û karê xwe bike, ku tu wê ji wî hovemêrî re bikî davek, wî bigirî û bi xwe re bo min bînî."

Nêçîrvan pere birin û çû pûtxaneyê, sê penes dane pîrê pûtxaneyê, keçikek lewend û çeleng bi xwe re bir û rûyê xwe da çolistanê, çû giha daristana ku berê Enkîdo li wir dîtibû, xwe di êvsînekê de li gel keçikê veşart, bê tewat û bê aramî herduwan çavrêya hatina cinaweran kirin.

Paş demekê, keriyê cinaweran hat, li derora kaniya Avsarkê ji wê geyayê geşbûyî çêriyan. Enkîdo jî di nav de, wekî wan devê xwe dixist geyayê şîn û dixwar. Nêçîrvan û keçikê bi dizîka li wan temaşa kirin, lê tenha dîna wan li ser hovemêr bû, li ser Enkîdo bû. Ji xwe berê mirovekî wekî wî nedîti bûn, tenha di çêrok û efsaneyan de li ser mirovên çolî bihîsti bûn.

Nêçîrvan bi dengekî jar gote keçikê:

„- Here carekê di wê ortê re bigere, bila tu bi ber çavên wî kevî, gava xwe ji te ve nêzbike, wê cinawerên dî li wî hişyar bibin û ji wî dilsar bibin, wê ji hev re bibêjin, ku eve bi wan re ne dilsoz e, û wê bi zûkî ji wî bidûrkevin."

Keçik ji cîh rabû, bi dilekî tijî tirs û guman paşiya xwe daweşand, ji êvsîna tarî û piçûk derket, û ber bi keriyê pezkoviyan ve çû. Keçik ji Enkîdo re bû davek, ku wekî wê dav ji çi cinawer ê cîhanê re nehatine venan.

Qey Xwedê jin bo nêçîrê dane, ku davên wan mêran digirin û nema berdidin!

Çavêd Enkîdo li wê ketin, wê jî mêşengiya xwe bi kar anî û wilo livlivî, ku daxaza li gan ketinê jê hate nasîn. Ji xwe ew di perestxaneyê de bo li ganketinê kar dikir, û li ganketin hîngê wekî histobariyeke jinan ji evdal û serlêderên perestgehê re. Evdalan herku dixwastin bi wan jinan rakevin, jin ji wan re amade bûn, û gava serlêderan dixwastin bi wan re rakevin, pêwîst bû hinek pere, qurban an diyarî, bo perestgehê bidana.

Keçikê hiş ji seriyê Enkîdo revand, ew ji keriyê xwe verê bû, bi gavin ji mêranî û dilxweziyê dagirtî ber bi wê ve çû, ku hîç carekê wilo dilgerm bi ser kesekî de neçû bû. Dilê wî jî bi daxaza liganketinê hatibû dagirtin, di çavlêdanekê de ew li keçikê suwar bû, û bejna wê nazik li dor xwe gerand, teviya hovîtiya xwe di canê wê de vala kir…

Hem nêçîrvan û hem jî cinaweran bi çavin beloq li wî nêriyan, ew çewa li ser sîng û berê wê hiltê û datê. Cinawerên matmayî mane, yekser ji wî bi dûr ketin, û pîremêyekî ji wan, ku berê pir ji Enkîdo hezdikir, bi çavin tijî dexsînî gote heval û hogirên xwe:

„- Min bo we nedigot, eve ne ji me ye?"

Teviya cinaweran seriyên xwe daxistin û yekûyek, bê ku biçin ser avê ji wê ortê bi dûr ketin, tevî ku li wir pir geyayê taze û xweşik li gel ava Kanîsarkê hebû. Nêçîrvanê ku di jîna xwe de ti caran lêketinek wilo bi hêz û germî nedîtibû, xaziya xwe daxurtand, û gellek dilşad bû, ku pilana bavê wî bi ser ket, Enkîdo ji cinaweran verê bû, an jî cinaweran ew li şûn xwe hêlan, dev ji wî berdan, nebez kirin.

Enkîdo wekî cinaweran bû, hema ew mirov bû, hêza wî pir di nav lingên wê keçikê de belav bû, ew sist bû, ji ber hev şeliya, rabû ku here, carekê li çarexên xwe nêriya, çavên xwe di dar û zinaran de gerandin, keriyê wî ji wir çûye, û hîngê li xwe hişyar bû ku ew ne pezkovî ye, ne asik e, ne gur û ne şêr e, ne hirç û ne rovî ye, ew cinawerekî ne wekî cinaweran e, lê ev mêya ku ew bi ser wê ketiye û bi wê re li gan ketiye, wekî wî ye, li ser du lingan digere û ji lêketinê hezdike…

Ma eve mirov? An mirovê ku teviya cinaweran jê ditirsin tiştekî dî ye?

Ew du gavan ji keçikê bi dûr ket, lê ser ji nû ve li wê zîvirî, û xwe avête ber lingên wê… Carek dî li hev ketin, û wê nas kir ku mêraniya wî bê wekanî ye, lew re gotê:

"- Mêraniya te wê te bike xudanê hêz û mal û gelek jinên hîn ji min sipehîtir û mêşengtir … Navê te çiye?"

Û ji ber ku, gava ew hatiye afirandin, ew hatibû fêrkirin zimanê mirovan, û navê xwe û ên hemî tiştan jî dizanî, yekser navê wî hate bîra wî, tevî ku berî wê rojê kesekî bang li wî nekiri bû, tew kesek bi wî re carekê jî nepeyivî bû.

"- Enkîdo."

Keçikê got:

"- Tu têdigihînî ez çi dibêjim?"

Enkîdo seriyê xwe sê caran bo erêkirinê daxist û rakir.

"-Niha tu hişmendtir bûyî. Di nav pezkoviyan de te zimanê wan li ciyê zimanê mirovan herdem bi kar anî bû. Were bi min re nav mirovan, emê biçine bajêrê Urûkê, ku li wir

perestgeha nûranî ya Anû û Iştar heye, û Gilgamêş bi hêza xwe ya hovî gelê bajêr binzor dike, zora wan dibe û wan ji xwe re dike kole an jî wan dide ber şûr û debanan, wan dikuje."

Enkîdo yê bi dîtin û naskirina dosteka wilo çeleng û nêrxwaz dilşad bûbû, bi zimanekî mirovî yê ne pir pêşkeftî got:

"-Min bibe ba Gilgamêş, yan ji min tê û yan ji wî, em ê binêrin, kî berxe, kî berane. Li Urûk ezê bi dengekî bilind bibêjim: Ez im Enkîdo yê ji gişan hêzdartir, ezê stoyê her yekî bi destan badim, û bavêjim ber lingan... Ez li çolê mezin bûme, ma kî dikare zora bad û bahozê, zora berf û baranê, û zora darên sindîgan û merxê bibe...?"

"- Were, Enkîdoyê min, were."

Keçikê wilo got û herdu bi hev re ber bi bajêr ve çûn, nêçîrvan jî bi dizîka her li pey wan çû, û pir dilşad bû, ku ewê ji Gilgamêş xilatek baş bistîne, ku ji wî re hovemêr ji keriyê wî verê kir û ew xiste dav û kemendên jinekê...

Heywax, jinan çendîn mêr wilo xistine xefkên xwe û ber bi paşerojek tehl û tarî ve li pey xwe rakişandine...?

Berî ku bigihin bajêr, keçikê kirasekî xwe şiqitand û bi wî nava Enkîdo pêça, da paş û pêşa wî piçekî bên veşartin. Ji xwe mirovan berê pir cil û berg nedikirin ber xwe. Kirasek û hew...

Di wê navê de Gilgamêş du xewn dîti bûn, di xewnekê de dîti bû ku kevirekî ji asîmanan ve ketibû ser zevînê, hemî mêrên li bajêr bi hêz û qanat bûn bizavên xwe kirin ku rahêjin wî kevirî, lê kesekî nekanî, û li dawiyê beziyan çûn ba Gilgamêş, ramûsîn dest û pêyêd wî, ew çû ser kêvir, bi asanî rakir û bir ji dayîka xwe re, û xewna xwe ji wê re hewalda, wê got:

"- Ev kevir nîşana hatina kesekî ye, ku pir ji te bi hêztire, tuyê pêrgî wî bê, tu yê wî bînî ba min, ewê harîkariya her kesekî bike, ku di tengiyê de ye, wê mêr û jin xwe bavêjin bextê wî û biramûsin dest û pêyên wî, lora ku ji wî hêzdartir di bin gombeta asîmanê de mirov nînin."

Di xewna dî de jî, Gilgamêş dîti bû ku palteyekî giran li ser rêyekê ji rêyên bajêr keti bû, mêrên bi hêz û qanat, tev bi ser wî palteyî de çûn, yek û yek li xwe zor kirin ku rahêjinê, lê kesekî di xwe de ew hêz nedît ku wî palteyî ji cî bilivîne. Beziyan çûn ber dergahê Gilgamêş, ji wî tika û lava kirin, ramûsîn dest û pêyêd wî, da ew biçe wî palteyî rake, ew çû û bi asanî rakir û anî ji diya xwe re.

Diya wî xewn wilo şirove kir:

"- Palteyê mêrekî bi hêz e û dostê mirove. Ewê bê ba te, û hûn dibin dostên hev, û ewê mirovan ji tengiyan rizgar bike, û ezê wî jî wekî te di dilê xwe de bi cîh bikim."

"- Dayê, bi Xwedayê mezin Inlîl, ez dixwazim dostekî min ê bi hêz hebe, ku harîkariya min bike, ji min re bibe destbirak û bo min bibe şêwirdar."

Enkîdo bi yara xwe re hate Urûk, çavên Enkîdo ji dîtina ewqas mirov di ciyekî teng de, ku di dorê re surhek bilind û qaling hatiye avakirin, beloq bûn, û guhên wî ji bihîstina ewqas dengên mirovan û şîngeşînga legan û das û pertalên ku têne çêkirin, bel bûn, seriyê wî tengijî û difna wî ji bihna coyên ava genî, ku di herdu aliyên kolanê re hati bûn kêşan, tijî bû, lê belê wan sêv û hinar û tirîyên li ser mihareyên ji wan dagirtî, wan cihêcihê kezeb û biryan û goştên ku dihatin biraştin, wan lîskên zarokan, stran û dûrikên keçên gulfiroş, û wan jinên çeleng ên bi rengareng cil û bergên xweşik di ber da, bi kofiyên giran, tev bi zêr û zîvan xemilandî, û wan bilibil û kewên di qefesan de, dilê wî revandin, pêjiniya wî ew di cîhana wî ya nû re gerandin, û bê ku li pêş xwe binêre, li pey keçika xwe gavkir, hinde caran destê xwe davêt milekî wê û dihejand, da ew jî wekî wî li vir û li wir binêre, hema ji bo wê her tiştekî bazarê wekî berê bû, cîhaneke Kevin, genî, teng û bê nûkirin bû, lê wê baş nedizanî çiqas nû bû ew cîhan bo Enkîdo...

Enkîdo di rê de gelek caran li orta xelkê ket, bi destekî ewana ji rêya xwe davêtin, wan jî bi çavin matmayî li wî dinêriyan û di ber xwe de digotin: "-Wey, ev çi hove, ev ji ku hatiye, qey tew bajar nedîtine...?" û hinekan ji wan jî êşa xwe dihanîn zimên, gava Enkîdo ewan ji ber xwe têvedidan...

"- Were bixu, Enkîdo, û were vexu..."

Keçikê bo wî mirîşkek girs a hatiye sorkirin û hîn germ bû kirriya û gotê:

"-Hajê bike, germ e..."

Enkîdo berê hîç carekê xwarinek germ nedîti bû ku bizane xwarina germ çîye. Ji geyayê sar û hinde caran goştê cinawerên mirdar pê ve, xwarinek baş nexwaribû. Goştê cinaweran gava taze ba germik bû, lê ji ber ku pir pevçûn li ser çêdibû, ew jî sar dibû û hêdî-hêdî genî dibû...

Bi zûkî mirîşk ji hev çirand, li devê xwe bada, û hîngê fêr bû xwarina germ çiye. Xelk li dora wan herduwan civiyan, da bibînin çewa hovekî nenas dixwaze wekî wan fêr bibe xawrina bajariyan.

Di wê navê de, keçikê destê xwe li paş pişta xwe vedigirti bû, û nêçîrvan ê ku li paş wî rawestiya bû, pere dixistin destê wê, da bide bo mirîşkfiroşê devê xwe vekiribû û bi çavin wekî yên mirîşkan li devê Enkîdo dinêriya...

Bi ser goştê mirîşkê de, zerikek mezin a tijî dimis kete destê Enkîdo, ew jî Hilda ser xwe, mixabin, ji ber naşarazabûna Enkîdo, ew dimis jî, wekî donê mirîşkê bi piranî bi ser pirça singe wî de herikî û hate xarê...Tiştekî wilo şirîn berê ji kokên daran derdixt û dixwar, lê

gelek caran bihayê wê mezin bû, pir mêşên hingiv davêtin ser wî û jehra xwe berdidan difna wî…

Komek lawan û keçên por lewendkirî, ku ji dûr ve li wî temaşa dikirin, gişa bi hev re kirine tîqetîq, bi wî keniyan. Dengê kenînêçi caran berê nehatibû guhên wî, ew bi wan law û keçikan pir dilşad bû…

Di wê rojê de, Enkîdo gelek mirîşkên biraştî xwarin û gelek kûzikên avjongê vexwarin, lê hîn jî tî û birçî mabû… êdî nêçîrvan rûtehl bû û penesên xwe bi hajêkirin dijimartin û dixistin destê keçikê…

Keçikê Enkîdo da bin bendekê, ku av di ser re dihate xarê û dikire xumexum, û bi harîkariya evdekî, ku çend penes dane wî û zerikek zeyt xiste destan, Enkîdo baş hate şuştin û paqijkirin, ew bihna geya û axê, mîz û qerêjê, bi ser de jî bihna donê mirîşkan û avjonga şirîn, tev hatin rakirin, li ba berberekî jî pirça wî ya dirêj keşexî kir û li ba miskfiroşekî ew gulweşîn kir, ta ew bû tiştekî dî, tew nema wekî cinaweran.

Ew nûkirin û mirovkirin ne bi dilê Enkîdo bû, lê hercar gava tîrek ji çavên keçikê li çavên wî diket, ew ji kabê ve sist dibû û fermanên wê bê Erê û Na bi cîh dihanî. Enkîdo bû tiştekî dî, bû mirovek… Heylo! Hov jî bi temîzkirinê dibine mirov…

(III)

Di wê navê de, şêr û gur li derdora bajêrê Urûk hebûn, roj bi roj davêtin ser pezê xelkê, şivan û gavan jî dikuştin û hêriş ser rêwiyan dikirin. Bajarî yên ku dizanîn Enkîdo çi pehlewane, ji wî lava kirin ku here wan qorî bike. Enkîdo şûr û mertal rakirin, kevan û tîr bi ser milên xwe xistin û ji bajêr derket, li gur û şêran geriya. Ew agahî di nav wan cinaweran de belav bû, û gotine hev:

"-Binêrin, binêrin… Me Enkîdo bi şîrê xwe mezin kir, ew bi ber bayê tolaziya xwe ket, bi dava jinekê ket, ji me verê bû, û niha jî hatiye nêçîra me, wekî wan mirovên dî…"

Enkîdo di demek kurt û kin de, gelek cinawerên çolê kuştin an birîn kirin, ku yekûyek ji wan çolan bazdan û reviyan, û bajarî bi wê serketinê dilşad bûn, navê Enkîdo jî wilo belav bû, ku ta dawiya dûrokê wê li ser zimanan bimîne, û lehengiya wî wê bibe efsane û di pirtûk û mejiyan de bimîne…

Rojekê Enkîdo bi keça xwe re, di nav baxekî de ketibû xilwetê û bi wê re li gan diket. Mêrek ji wê ve hat û kêfê wan li wan herimand. Enkîdo ji wî xwast, ku ew ji wir here, lê neçû. Rabû keçikê ji wî pirsiya:

"- Tu çi ji me divê?"

Mêrê nenas bersîv da, got:

„- Ez dixwazim, Enkîdo te bibe ji şahê me Gilgamêş re, ku bi te sebra xwe bîne. Tu hîn nebûyî bûka kesekî heta roja îro, mafê standina her bûkekê li bajêrê Urûk yê şah e, piştre yê zavayê wê ye, ma tu vê nizanî?"

„-Ez a ji dûrwelatekî me, di rê de diz û keleşan, talan anîn ser karwanê me, min û gelek keçik û jinên dî revandin û em anîn li Urûk firotin şah Gilgamêş. Ez bi fermana Gilgamêş bi nêçîrvanekî re çûm darisatnê, ku li Enkîdo bigerim."

„- Gilgamêş niha dixwaze bi te re rakeve, ma çi ji destê min tê."

Rûyê Enkîdo ji xeyda perçifî, dest avête şûrê xwe û ber bi bajêr ve gavkir, mêrê nenas û keçika diltirsiyayî bi pey wî ketin. Ew çû Gilgamêş bikuje.

Kesekî di bajêr de Enkîdo berê wilo rûtirş û çavagirî nedîtibû, ji rêya wî xelk reviya, li meydana serekîn a bajêr ku bazarek fireh û şênkirî çêbû bû, Enkîdo kire qîrên, gazî kir:

„-Gilgamêş ê zorbaz, were ji koçka xwe ya kêrguhan dakeve, da em bibînin, kî ji me bûkên kê distîne."

Ji her aliyekî ve mirov li dora wî civiyan, lê dûr ji wî wekî gustîlkekê di orta meydanê de, di tenişta hev de, du qorî û sê qorî rawestiyan, û bi çavin tijî tirs û pirs li wî nêriyan. Kar û barên xwe yên bazarî tew ji bîra kirin, û delîveyek baş bo dizan çêbû ku bi asanî tişt û pertalên wan, bizin û mirîşkên wan bidizin, an jî hejar û birçî zikêd xwe bi xwarinêd tamxweş dagirin.

Nûçe giha Gilgamêş. Çavêd wî sor bûn, ji ser doşeka xwe ya qaling di razangê de, ku sê keçikên ciwan û çeleng bi wî re nîvtazî ketibûn kêf û xweşiyê, hilgavt, û bi orta bajêr de daket, bê çek û bê deban. Ji xwe kesekî Urûkê nediwêrî li çavêd wî binêre, gava ew di nav gel re digeriya.

Ma kî yê di xwe de bibîne ku seriyê xwe li wî hilde û şûrê xwe bi ser Gilgamêş de daweşîne, qey dawiya cîhanê hatiye?

Gava ew gihaye meydana serekîn, ku berê mey lê dihate çêkirin û rijandin, û niha serî lê tên firrîn û xûn têye pijiqandin, gustîlka mirovî li ber wî ji hev bû, dora çar gavan mirov bi paş ve ji hev vekişiyan, Gilgamêş ber bi Enkîdo ve çû, û herdu destên xwe wekî du dasan dan ser nava xwe, bê liv û şiv li hember Enkîdo ziq rawestiya, wekî kûzekî pir mezin ê bi du qulpan xweya bû. Çavêd gel di navbera herdu mêrên girs û qanat de çûn û hatin, lîstin û velîstin.

Gilgamêş got:

„- Kîyî tu, ku tu min ji dêrîna min û ji gelê min bikî? Ma tu nizanî, ku Xwedayê mezin Inlîl ev bajar daye min, û hemî kesên Urûk berdestên deselata min a herheyî ne?“

„- Ma Xwedayê mezin Inlîl ew maf jî daye te, ku tu azadiya mirovan binsol bikî, dest bavêjî mal û dêrînên wan, jin û bûkên wan ji destên wan derxînî?“

Wilo got û şûrê xwe ji destê xwe avête ser zevînê, ku bi keviran hatibû cilkirin. Gilgamêş ji cî liviya û herdu ber bi hevdu ve beziyan, wekî du çiyan li orta hev ketin, şirqînî bi asîmanê ket, birûskê lêda û bû xumexuma ewriran. Demeke dirêj vir de û wê de hevdu rakişandin, têvedan, li hev dan û bizava zorbirina hevdu kirin. Herdu bi hêz, û herdu bi kîn û nevîn, yek ji yekî danaxîne, yek jî yekî kêm nake. Gustîlka mirovî pir caran ji hev şeliya, Gilgamêş û hembervanê wî Enkîdo gelek maseyên bazarê avêtin xarê, tişt û pertalên bazariyan di nav lingan de hêştin, pir kûzên mey û mast û avjongê şikandin û bi pençan kizotên agirê di bin biryanê de avêtin ser hev, rûyêd hevdu birîn kirin û sotandin.

Ji nîvro de ta dema sorbûna asoyê li rojavayê asîmanê, ku ro bi paş zincîra girên piçûk ketibû, û bi tevayî winda bûbû. Li dawiyê Enkîdo lingek bi ber Gilgamêş ê westiyayî xist û rump ew li erdê xist, û kaba xwe kire ser sîngê wî yê mezin û bi pirç, û bi hêrs guvaşt û lê zorkir, ku êdî du parsuwên wî jî şikestin. Axîneke kûr ji ber êşê ji Gilgamêş hat. Enkîdo gotê:

„- De bese, li hember min kosaniyê neke, ne tu û ne kesekî dî li ser rûyê zevînê dikane zora min bibe. Xwedayê mezin Inlîl ev hêz daye min, wekî deselatî daye te.“

Hîngê Gilgamêş bawer kir, ku dest di ser destan re hene, ta mala Xwedê…û ji nişka ve şirovekirina herdu xewnên wî ji aliyê dayika wî ve hatine bîrê, dema wê gotê:

“- Wê kesekî pir bi hêz bêye ba ta, hûnê bi hev biçin û pişt re bibine dostên hev, gava ev bûyer çêbû, hîngê dostê xwe yê nû bîne ba min, ezê ji wî hezbikim wekî ez ji te hezdikim û ezê wî jî wekî kurê xwe bixînime bin basikên xwe.“

Enkîdo kaba xwe ji ser sîngê Gilgamêş sist kir, milê wî yê di destê xwe de bada bû berda, û herdu bûne dost û destbira…

(IV)

Li welatekî dûrî Urûk, li çiyayên bilind ên Fînîqiya, dêwekî bi nav û deng hebû, jê re digotin Çûmbava û digotin Hovava. Dêwekî zorbaz û şeryar, ku Xwedê ew bo herifandinê, wekî bad û bahozan pêda kiribû, an jî wekî gurekî çilek, zikbirçî û dev bi xûn…

Ji xudanê xwe re darên Erîzê, ku wekî merxên çiyayî ne, diparist. Di koka dareke pir mezin de dergahê perestgeha xwedîkên Anûnakî hatibû kolan. Çûmbava (Hovava) ewqas bi hêz û şeryar bû ku hemî Fînîqî ji wî ditirsiyan û li hemberê dilerizîn.

Gilgamêş navê wî dêwî bihîstibû û pir hezdikir wî bikuje, da wan darên Erîzê bistîne, wan bibirre û ji koçk û seraya xwe re bike stûnên avahiyê, û bi kuştina wî ji xwe re di cîhanê de navekî li şûn xwe bihêle, gava koça xwe ya dawîn dike. Gilgamêş dizanî, ku gelê Fînîqiya newêre ji ber wî destên xwe bavêje wan daran, û wê pir dilşad be, gava lehengek ji dûrwelatan ve bêye Fînîqiya û gelê wê ji zorbaziya Çûmbava rizgar bike, pişt re bi wan re wan darên kokqelew û hêzdar parve bike.

Gilgamêş daxwaza xwe ya dil ji Enkîdo re anî zimên, gotê:

„- Li welatekî dûr ê paş wan girên, ku ro li paş wan diçe ava û radize, ku jê re dibêjin: Fînîqiya, dêwekî pir qanat û bi hêz heye, ew li ber daristanek çiyayî ye ji darên Erîzê, ku wekî darên Merxên çiyayên Kardoxiyan in, nehêle kesek wan bibirre an jî hilbike... Divê em wî bikujin û wan darên hovane bibirrin, ji koçk û serayên xwe re kokên wan ên qelew û bi hêz bikine stûn û hilgêr...

„- Emê çewa wan kokên giran û qaling bînin?“

„- Emê bi karwanekî qantiran ta bi çemê Ferêt bînin, û emê wan bi hev ve girêbidin û wekî kelekan bavêjin ser avê, wê bi asanî ta bi Urûk di Ferêt re bên.“

„-Tu çi li ser Çûmbava dizanî?“

„-Gava Çûmbava diqîre li zireyê ‚derya' pêlên wekî çiyan radibin, gava dikuxe mirinê bo ên dora xwe tîne, û gava pufdike agirê ji devê wî deh gavan xaziya wî dipijiqe, wekî ejderhayekî efsaneyî ye, kes newêre xwe ji wî ve nêz bike.“

Cara yekê bû di jîna Enkîdo de ku tiştekî wilo bi tirs dibihîse. Got:

„- Ne baştir e ji me re, em berê xwe bidine welatê Dîlmon, ku mirov li wir namirin, herheyî dijîn, û kesekî wekî Çûmbava li wir nîne ku zora me bibe û me bikuje?“

Gilgamêş got:

„- Ez ê biçime Fînîqiya, da wî bikujim, bo min tenê palteyekî giran pêwîste, gava tu naxwazî bi min re bêyî, merem tu ditirsî, tu li mal bimîne, xelkê Urûkê û deselata min biparize heta ez vedigerim.“

Enkîdo bersîv da, got:

„- Emê çewa xwe bigihînin nav wan daran, ku ji dêwekî wekî Çûmbava ve tên paristin, û Xwedayê mezin Inlîl ewqas hêz daye wî?“

„- Erê, Xwedê ew hêz daye wî, ku mirovan bitirsîne, da kesek darên Erîzê nebirre, lê em dikanin bi hêza xudanê me Şamş zora wî bibin. Qey tu ditirsî? Ê min, ez bi xwe diçim, û gava ez bême kuştin, wê navê min di dûrokê de wekî lehengekî, ku di pevçûnek mezin de hatiye kuştin, li şûn min bimîne. Gilgamêş çû bû Çûmbava bikuje û darên Erîzê bibirre, di pevçûnê de bi Çûmbava re hate kuştin! Ma ji vê yekê xweştir nav û bîranîna navekî mirovan heye?.“

„- Wilo?“

„-Erê, wilo, û ez niha ji hesinkarê xwe dixwazim, da palteyekî bêwekanî bo min çêbike.“

„-Te xûna min keland, were, em bi hev re diçin.“

Rabûn herdu bi hev re çûn ba hesinkarê şahanî, ji nav gelek şûr û das û ruman û tîrkevanan bo xwe yên tev baştir û bihatir standin, sê rojan ta ewana baş hatin avdan û tûjkirin, û bihayê wan bi gelek zêran dan.

Çavikên xiniz û e'wan, ku ji pîr û serekên olî re, li teviya bajêr de belav bûbûn û her gotineke ne bi dilê wan pîr û mezinan bû, bi zûkî digihandin wan, û gelek şorên xwe jî didan ser, da xelkê bêtir bicivilînin û binzor bikin, biryara Gilgamêş û Enkîdo ji hesinkaran bihîstin û bi zûkî gihandine pîrê mezin, ê ku di berdestiya perestgeha Şamş û Inlîl de bû. Pîrê mezin jî civata mezinên bajêr haydar kir, û di wê rojê de civat bi lez û bez çêbû.

Mezinên bajêr, ku ditirsiyan Gilgamêş bite kuştin û deselata wan biherife tew nedixwastin ew biçe. Paş gengeşeyeke kurt û kin, pîrê perestxaneya Inlîl û Şamş gote Gilgamêş:

„- Şahê min ê wêrek, tu hîn ciwanî û xûngermî, tu tew nizanî Çûmbava li kijan çiyan dijî û kijan daristana Erîzê dipê, tuyê wî li ku bibînî? Tu tew nizanî çi çek û debanên wî hene, û ya em baş dizanin, ewe ku ta roja îro kesekî hîn zora wî nebiriye, ewên ku çûne nêçîra wî yekûyek hatîne parçeparçekirin, seriyên wan ji leşên wan hatine cuda kirin, û kesek ji wan venegeriye memlekta xwe."

Roja dî Gilgamêş û Enkîdo çûn ber pûtê Şamş, xwe li ser kaban berdan ser mermerê perestxaneyê, ji pûtê kevirî re seriyên xwe çemandin, û ji wan pût û hîman piştvanî û rêdayîn xwastin.

Pîrê mezin bo herdukan li ser jarbûna hinek ciyan di surha Urûk de peyivî, da wan ji rê bêxîne, û ewana bi xortkirin û mekinkirina surhê ve gêro bibin... Hema Gilgamêş tew guh neda wî...

Rabû pîr hemî jinên çelengên nîvtazî û lawaz û pirlîsk bi ser herdukan ve anîn, di dora wan re gerandin û hilperikandin, lê bê çare...

Gava pîrê mezin dît ku Gilgamêş û Enkîdo ji ya xwe namînin, rabû got:

„-Gilgamêş, nabe tu ji bajêr derkevî, bê ku tu biçî destûrê ji dayîka xwe Nînsson bixwazî, heger tu bê dilkirina dayîka xwe biçî, wê vegera te nebe, bad û bahoz û firtene wê te ji rê bikin, wê gelek cinawerên çolistana fireh a di navbera Urûk û Fînîqiya de bavêjin ser we, wê mar û ejderha di rêya we kevin, bi we dadin û we bijehirînin, û wê talankerên Tesm û Cudeysên ku zaroyên Malbata Ednan in cil û berg û çekên we ji we bistînin, hûnê tazî û pêxas di ser qûma germ a wekî agirê re biçin û hûnê bi pey serva bêşeyê ‚sehrayê' kevin, ji we ye, ku ew ave, û wilo hûnê winda bibin, û ji mar û dûpişk û kêzikan re, ji qertel û bazan re, bibine xwarin."

Diya Gilgamêş Nînsson jî bizava xwe ku kurê xwe û dostê wî Enkîdo ji rê bêxîne, hema bizava wê bi ser neket, û gava baş naskir ku ewana wê biçin, dilê wê nerm bû û nexwast dilê kurê xwe ji daxwazeke wî an ji hîviyeke di sîngê wî de ye bihêlî. Wê baş dizanî ku heta

Enkîdo xaşe, ew nahêle kesek zora kurê wê bibe, an ziyanek bigihe wî. Rabû qurbaniyek bir ber pût û hîmê Şamş û ji pîran tika û lava kir, ku rê bidine kurê wê û dostê kurê wê, dirazan li ber xudîkên xwe bikin, ku wan herdu ciwanmêran biparizin û herdukan ji wê re bi saxî vegerînin.

Gilgamêş gazî li gelê Urûk kir, gel tev li meydana serekîn civiya, û bi çavin tijî pirs li Gilgamêş û Enkîdo temaşa kir, çewa herdu di bin çek û deban û zirxên xwe de giran-giran ber bi hespêd xwe ve diçin, û pişt re bi harîkariya berdestan pişthesp dibin. Gel bi xweşî û şadî li pey Gilgamêş û Enkîdo ta bi dergahê serekîn ê bajêr hat, bê ku baş bizane, herdu lehengên şervan ku ve diçin... Pîrê mezin û serekên bajêr bi çavin agirvêketî li herduwan dinêriyan, lê newêrîn li ber gelê piştvan tiştekî bibêjin.

Basikên dergahê heftqatî, ku ji hesin û kokên darê xurmê hatibûn çêkirin, û bi mêxên nîvgavî hatibûn zemirandin, ji aliyê deh mêrên hêzdar ve ji hev hatin vekirin. Gilgamêş û Enkîdo bi hev re, di Dergahê de, li ser hespên xwe rawestiyan, hefasrên seriyên hespan kişandin û ber bi paş ve geriyan. Bi nîşaneke destê Gilgamêş re dehol û zurne û çang rawestiyan.

Gilgamêş li gelê xwe yê xweşiyar bi serbilindî nêriya, û destêd xwe rakirin, hemî dehol û zurne û çang rawestiyan, û bi dengekî bilind gote gel:

„- Ez diçim Fînîqiya ku dara Erîzê ya di koka wê de peyamnêrên şer û neqenciyê malêd xwe kolane, bibirrim, û ji we re seriyê Hovava yê şeryar bînim, da hûn baş bizanin ku kesekî ji kurê Urûkê, ji şahê we Gilgamêş, li ser rûyê vê zevînê hîn ji dayîk nebûye, û bi wê yekê wê navê min û navê Urûk di dûroka mirovan de herheyî bimîne..."

Carek dî berê xwe ber bi hîşta derveyî kelê de kirin, ji bajêr derketin, û bi ser seriyên wan de gul û gulav ji ser surhên kelehê ve hatin weşandin û reşandin. Bi Dehol û çang û zurneyan heytehola birêkirinê hate tevakirin.

Teviya gel bi hev re kire hêlehêl û ji şabûna xwe dîlan û sema pêdakirin, lê teva dizanîn ku Gilgamêş ne yê tev bi hêz e li ser rûyê zevînê, Enkîdo yê ku bi wî re li ber dergahê bajêr rawestiya bû, berê zora wî di qutêkirinê de biribû. Lê belê hîviya wan ew bû ku Gilgamêş biçe Fînîqiya û li wir bi destê Hovava bite kuştin û ewana ji zorbaziya wî azad bibin... Ji xwe her deselatdarek derewek wilo li xwe û li gelê xwe dike, xwe wekî hêzdartirîn deselatdar dide xuyakirin, hema gel dizanin, ku rastî ne wilo ye, û ew pesindariya xweyî ji xûsk û hewesa zordarane, ji fantaziya wan e û ji tirsa wan e.

Gilgamêş û Enkîdo bi roj û şevan di deşt û çolan re ber bi rojavayê ve, ber bi welatê Fînîqiya ve çûn. Di rê de pir caran bi mêrên qanatên gelê Tesm û Cudeys re, ku ji zaroyên Ednan bûn, ketin pevçûnê, nehêlan ewana çek û deban û cil û bergên wan talan bikin. Li pir deran bê av û nan man, û di şikeft û qelîştekên kevirî de razan, yek ji yekî re bû pawan, da gur û dêlguran qorî bikin, xwe ji pir mar û dûpişkan paristin, û di bin roya bi tîn de rojên xwe, bi lêvên zuwabûyî derbas kirin, an jî bi pey seravê ketin, ku bi gumana wan ew av e, ji

dûr ve dixuye, lê di rastîniyê de, ew ne tiştek bû, ew serava bêşeyê bû, wekî pîrê mezin ê pûtxaneya Urûkê ji wan re gotibû…

Li dawiyê, şînayî û avedanî, dar û mêrgên Şamê ji dûr ve xuya bûn. Bihna geyayê şîn hate difna Enkîdo… Herdu berken bûn, û zanîn ku ew ji devê mirinê vepekiyan, ne bêşeya hovane û ne jî talankerên wê, nekanî bûn wan bikujin an ji rê bikin. Hîngê heyva ku di destpêka rêketina wan de yekrokî bû, êdî mehek xwe derbas kiri bû û careke dî bûbû çarderojî…

Dibe ku ew tew heyvek dî bû, ne ya welatê wan bû, an jî her êvarekê heyvek nû ji asoyê sor derdiket, bilind dibû û bi berbangê re diçû ava, û yeke dî bi êvara dî re li ciyê wê derdiket. Kî rastiyê dizane?

Gilgamêş wilo di dilê xwe de li ser heyvê dihizirî…

Li welatê Şamê, av pir bû, li her derekê kanî, cobar û nihal hebûn, çiyayên bilind hebûn, û ji wan jî çiyayekî dûr ê ku bi kulehekî berfanî dixuya, dîna Gilgamêş û Enkîdo bi ser xwe ve kişand, ji ber ku wan di teviya jîna xwe de tiştekî wilo gir û bilind, ku kulehê wî ewqas sipî nedîti bûn. Gilgamêş sê zêr dane rênasekî, da wan di nav çiyayên bilind û nihalên teng re bibe, bigihîne çiyayê darên Erîzê, ku li rojavayê welatê Şamê dikeve. Rênasê wan gava dara Erîzê ya pêşîn ji dûr ve dît, ji tirsa re lerizî û bi paş ve zîvirî û got:

„-Ji vir û pê ve, welatê Fînîqiya ye, ez newêrim bêtir biçim, gava Çûmbava me bibîne,wê me kerker bike, serî û leşên me ji hev bike…“

„-Başe, êdî tu here, vegere mala xwe, û ji zarokên xwe re xwarinek baş bibe û hinek cilên paqij ji xwe re bikirre, bihna te wê Çûmbava û me jî mirdar bike.“

Gilgamêş wilo got û bi destê xwe li pişta rênasê Şamî de, toz jê pijiqî, ew bi devgeza çû xarê û kulxan ji zevînê rabû…

Gilgamêş û Enkîdo çend gavan di nav darên Erîzê re, ku bi tapê xwe tirs davêtin dilan, geriyan, ji qîjeqîja firindên goştxur ti deng nehatin guhên wan. Gilgamêş got:

„- Em çiqas bigerin jî, dibe em Çûmbava nebînin. Baştir ewe, ku em çend darên Erîzê bibirrin, ta ew bi xwe bi ser me de tê, hîngê emê binêrin, kî ji me berx e, kî berane.“

„-Herê. Tu rast dibêjî.“

Her yekî ji wan palteyê xwe ji ser milê xwe danî û dest bi birrîna daran kirin, dengê lêdanên palteyan bi ber newalan ket. Pir ji dûr ve Çûmbava bihîst. Got:

„- Ev çi deng e? Kîye evê wêrek, ku vê rojê hatiye xûna xwe li van çiyan birijîne? Qey wî nebihîstiye ku ez li ber darên Erîzê me, ji xwedîkê xwe Anûnakî re diparizim…? Ezê bi rovikên wî birînên li darên min bûne derman bikim. Ez im Çûmbava, Çûmbavayê ku kesekî hîn zora wî nebiriye.“

Lê gava dara yekemîn hate birrîn û bi xarê de bi ser teht û zinaran de gêr bû, rumpiniya koka wê ya giran ewqas bilind bû, ku Çûmbava nas kir, ew çi deng e, û seriyê wî yekser tengijî, weku kesekî bi palteyê li nava wî daye, di cî de rûnişt, û xeyd di damar û rehên wî re bi jor ve hilkişiya orta seriyê wî, destê xwe avêt eniya xwe ya wekî kizotê agirî germ bûye û qîrênek hovane bi wî ket, ku hemî firind û cinawerên wan çiyan ji tirsa veciniqîn û baz dan. Hurmîniya Çûmbava ji ya şêrekî birçî û xeyidî bi hêztir bû, ewirên asîmanê jî wilo bi sur nedikirin xumexum, û berê xwe da aliyê ku dengê ketina darê jê hatiye, gavên xwe bi lez avêtin, kevir ji ber pêyên wî yên xas firiyan û deng ji wan hat. Gilgamêş û Enkîdo hurmîna wî bihîstin û palteyên wan li banî, di ser seriyên wan re, bê liv man.

Efsane dibêje, ku xudîkê wan Şamş ji paş heft qorên asîmanê ve deng li wan kir, got:

„- Dilên xwe xort bikin, netirsin, bi nav daristanê de biçin, ku mala Çûmbava ye. Herku ew bixeyide, ewê şaşiyan bêtir bike û hûnê kanibin zora wî bibin... Ezê harîkariya we bikim... netirsin, netirsin... "

Gilgamêş û Enkîdo bi piştvaniya xwedayê xwe Şamş dilşad bûn û tirsa ku piçekî cîh di dilên wan de girtibû, bi zûkî wekî mijê sibê belav bû. Ewana hîn bêtir bi nav daristana Erîzê de çûn. Çûmbava ewana dîtin, û ji ser girekî bilind ve li wan qîriya:

„- Ezê we parçeparçe bikim, hestiyêd we bişikînim, xûna we birijînim û we bikim qurbanên ji bo dara ku we birriye. Ma hûn nizanin ez kî me, hûn wilo li ser destên xwe, derbas dibin mala min a pîroz?"

Gilgamêş xwe li ser kaban berda ser zevînê û li ber xwedîkê xwe Şamş geriya ku dilê wî xorttir bike û harîkariya wî bi zûkî bike.

Ji her aliyekî ve bayekî tund rabû, bahozek bi hêz bi ser Çûmbava de hat, di nav toz û kulxanê de winda bû, nema ew dikane Gilgamêş û Enkîdo bibîne, nema dikane çavan veke. Ew pirsiya:

„- Hûn çi kesin?"

„- Ez Gilgamêş im, xudanê Urûk, li ber ava Ferêt, ku bi xarê de, ber bi zireyê Hurmiz ve diçe, eve jî destbirakê min Enkîdo ye, parek ji me mirovî ye û sê parên dî xwedayî ne, teviya mirovan ji hêza me ditirsin û cinawerên çolan ji ber me direvin."

„- Ha... ha... ha... Emê binêrin, ka ez ji ber we direvim an jî wekî dara min we birriyayî ez we dikim duta û rovikên we bi ser rîş û belanan ve belav dikim."

Gilgamêş got:

„-Ezê darên te yên hovane yekûyek bibirrim û bibim welatê xwe, da kokên wan bikim estûnên koçk û seraya xwe. De were meydanê, ka tu zora me dibî, an jî em seriyê te bi xwe re dibin bo zaroyên Urûkê, da ji xwe re bikine topa lîskê."

Gava bad û bahoz hîn bi hêztir bûn, Çûmbava êdî zanî ku evana ne mirovin wekî mirovên dî ne, lew re bi lawazî û xapînî gote wan:

„-Gilgamêş, bihêle ez bibim koleyê te, ezê bi xwe ji te re darên xwe bibirrim, li pişta xwe dim, û ta bi çemê Ferêt şelek bi şelek bibim, da tu kokên wan bibî, ji koçk û seraya xwe re bikî estûn.“

Gilgamêş û Enkîdo li hev nêriyan û nizanîn çi bersîvê bidine Çûmbava. Dawî Enkîdo gote Gilgamêş:

„- Guh nede wî, ew dixwaze me bixapîne, heger tu wî nekujî, ewê bi harîkariya xwedîkê nebaşiyê û zêrzemînê ‚jêrzevînê‘ hêzdartir bibe, û wê ji nişka ve delîveyê bi destê xwe xîne, wê me herduwan bikuje.“

Paş ku herdukan biryara xwe bi kuştina Çûmbava dan, bi lez û bez bi ser wî de gav kirin, bi şûr û palte û rumên xwe li wî hatin hev, hûrehûra wan li qatê asîmanê yê heftan dihate bihîstin, û çiyayên Haramon û Qasiyon ji dûr ve ji ber kumpekuma pêyên wan lerizîn. Heft roj û heft şevan bi hev re ketin pevçûnê, tî û birçî bûn, westiyan û xulmej bûn, hema kela dilên wan danehat, ta li dawiyê Enkîdo şûr da qirka dêwê hovane, Çûmbava wekî dîwarê kelehekê gava tê herifandin hate xarê, xûn ji histoyê wî pijiqî, kevir û zinar û belan sor bûn, û bi lêdaneke birûskî re Gilgamêş seriyê wî, yê wekî yê ejderhayekî bû, firand, leşê wî ket ser rêyekê ku gelek toz û kulxan jê rabû, di çavêd Çûmbava de cara dawî tîrêjên bi hêz ên royê vebirisîn û can ji dest da, darên Erîzê kirine guveguv, wekî komeke jinebiyan ku bi ser mêrên xwe yên mirî de dinalin, dengekî bi sohtîn ji wan hat.

Gilgamêş seriyê Çûmbava xiste tûrikê xwe yê xwarinê û rabûn karê xwe gudandin, darên Erîzê yekûyek birriyan û bi ser newalê de anîn xarê…Daristana Anûnakî ku ji aliyê Çûmbava ve dihate paristin roj bi roj jartir û piçûktir bû, tar û mar bû…

Gilgamêş û Enkîdo gelek kokên darên Erîzê birriyan, li pişta qantir û koleyên Şamî dan, û bi pereyekî hindik ewana giş gihandin ava Ferêt, deste bi deste,şelek bi şelek, bi hevdu ve girêdan û avêtin çemê bi hêz û ji xwe bawer, û kokên daran ber bi welatê Gilgamêş ve bi ser avê ketin çûn.

Ma kî diwêre destê xwe bavêje wan û ji avê bikişîne, bo xwe bibe? Êdî ewana bûne dêrîna Gilgamêş…

Gilgamêş û Enkîdo jî li ser keleka xwe dilşad û serbilind vegeriyan çûn welatê xwe.

(V)

Di nav şabûnek mezin de, Gilgamêş û Enkîdo heft roj û heft şevan bi gelê Urûk re derbas kirin.

Li ba Enkîdo du xweşiyên tev hêja di jînê de hebûn, xwarin û kutana jinan, û wan herdu xweşî ji wî re bi asanî hatibûn pêdakirin, di wan heft roj û heft şevan de, ji xwarin û kutanê pê ve karekî wî tune bû…

Gilgamêş jî bi cilên xwe yên şahanî, ku bi nexşên zîvî û zêrîn bûn, çavên gelek zeriyên rindik di bajêr de bi ser xwe ve anîn, lê bêtir ji tevan xûna Işţar, dota Anû, ku li ba Urûkiyan xudanê dergahên asîmanî bû, bi ser wî de keliya. Işţar ji çelengî, mêranî û hêzdariya Gilgamêş hez kir, û nema dikanî dîmenê wî ji seriyê xwe û ji nav xewn û dilxweziyên xwe bavêje.

Bi şev hate ba Gilgamêşê ku di nav pixûr û miskê de, li ser doşekek ji perrê nermê tilûran hatibû dagirtin, û di ser re teylesan û mexmel û hevrîşm hatibûn rêxistin. Mêbûna Işţar, ku mîna pilingekî bi hêz bû, ew bi ser Gilgamêş de kişand û anî. Xwe li ber lingên wî wekî pisîkekê dirêj kir û gote Gilgamêş:

„- Were bi min re Gilgamêşo, davdiliyê mino, ezê te li xwe mêrbikim, bo qelenê te, ezê qentarek zêr bidim, ezê kûzên tev gir û mezin li Urûkê ji elmasên Hurmizî tijî bikim, ezê baxê te bi kew û tawûs û bazên çiyayê Godî şên bikim, ezê ji te re asikên deşta Xeten û bilbilên Reşbîlê bînim...Bila dekên ‚dolabên' serdeka me ji zêrê zer bin, û qoçên zurnekarên dewata me ji durreyên Hindistanê bin…"

„-Iştara ku wekî tariya şevê, her tiştekî dixîne bin xwe û berşê dike, tu mirovan wekî bajêrê ku lerizînê lêdaye, hildiweşînî, tu wekî bahozeke berfanî ya bi ser baxekî de hiltê û her mêweyekê diherifînî, ne hezkirin û ne evîndarî di dilê te de hene, ne jî dilovanî û liberketin… ma ne tuyî, ya ku evîndarê xwe Temmûz da girîkirinê, ku hêsir ji çavan bariyan, ne tuyî, ewa ku dilovanî ji dilê nêçîrvanan derxistiye, ku davên xwe li ber asik û pezkoviyan vedigirin, û gava wan digirin seriyên wan dibirrin, ne tuyî, ewa ku qumrîvan fêr kiriye qumriyan biçêrîne, û gava ji wan hosan dibe, basikên wan dişikîne, ne tuyî, ewa ku ji baxvanê bavê xwe, ji Inşûllano hezkiriye, wî jî ji wê hezkirina xapînok bawer kir, her roj ji te re sepetek xurme anî, û gava te teviya hingivê wî mêt, te ew mîna papekî vala avêt û pêlêkir… Heger tu min bi nav davên xwe xînî, tuyê min jî wekî hemî perwaneyên bi ser agirê te de firiyane û tev hatine sotandin, ji mêşengî û dilxweziyên xwe yên hovane re bikî qurban…“

„- Başe, ezê li te mînim, ka ez dikanim çi bînim seriyê te, ey golikê har ê ku bê hefsar di nav geyayê jînê re digerî û tinaziyên xwe bi mêşengiya min dikî!“

Iştar xeydî, çavsor û diltengijî, ber bi bavê xwe ve beziya û giliya xwe li ber wî kir.

Bavê wê Anû, ku gelek hişmend bû, bersîv da, got:

„- Diyare te bîzavên xwe kirine, ku Gilgamêş bi nazikiyên xwe bixapînî û bi davên xwe yên mêşengiyê bigirî. Ne wilo ba Gilgamêş bi zimanê req û hişk bi te re nedipeyivî.“

„-Bavê min î nedost û neyar, Ka hefsarê taneyê asîmanî yê herifdar bide min, ezê wî bibim û bi ser bajêrê Urûk de biçim, ezê bihêlim, ku ew bi qoçên xwe yên hêzdar surha keleha Gilgamêş biherifîne, û zikê wî biçirîne, û rovikên wî wekî topek kêndirê bavêje, bi ser rîş û belanan ve belav bike…“

„- Na..na..Ez taneyê asîmanî nadim te, tuyê di nevîn û xeyda xwe de gelek nebaşiyan bikî. Gava mêyek dilxweziyên xwe bi cîh neyîne, ew ji marekî bi jehirtir dibe, ji dêwekî bi hêztir dibe û dilê wê ji zinarekî hişktir dibe…“

„-Heger tu taneyê „gayê“ asîmanî nedî min, ezê herim bi lingan li dergahê jêrzevînê bidim, ta ez wê dergahê diherifînim, û hemî miriyên di goristanê de azad dikim, da derkevin ser rûyê zevînê û zindiyan tevan bixun.“

„- Gava ez taneyê asîmanî bidime te, wê heft salan li ser rûyê zevînê bêbaranî, hişkî û bêgeyayî be, ku zindî birçî bibin, û dijûnan bo asîmanê bikin.“

„-Min ji mirovan re gelek genim û cihe, bo sewal û cinaweran geya û goşt civandiye, ku tew xema min ji wî alî ve nemaye.“

Gava Anû van gotinên dawî bihîstin, dît ku mafê dota wî heye, taneyê asîmanî ji wî bistîne, lew re hefsarê taneyê har ê ku di cîhanê de bahoz û firtene li şûn xwe dihêlan, da destê wê, û got:

„- Ka tu dikarî çi bikî, dota min a dil tijî vîn û daxwaz!“

Iştara ku evîna wê bûye nevîn û kîn, taneyê xwe daxist ber çemê Ferêt, û bi ser bajêrê Urûk ve ajot, bû bad û bahoz, bû toz û tolaz, ro ji qeter û kulxanê hate pêçan û veşartin, bajarê Urûk kete tariyê û tirsê dilê gelê wê girt.

Gilgamêş ferman da ku sed mêrên qanat û hêzdar derkevine meydanê, da rê li taneyê asîmanî yê har bigirin, nehêlin ew xwe bigihîne bajêr û biherifîne. Carekê tane ûriya û ji ber hêrsa wê ûriniyê dîwarê surha bajêr beqiya, zevîn lerizî û wan sed mêrên ku hatibûn rê li wî bigirin, giş di qelîştekên zevînê de, tev li çek û debanên xwe binve çûn, kes jê nema. Rabû Gilgamêş dused suwarên ku li ser piştên ga û hesp û fîlan bi ser taneyê asîmanî de şandin, ewana jî bi ûrîna tane re, wek perrên mirîşkan, ku bi ber bayê dikevin, hatine avêtin, tertbelav bûn, û bû rumperumpa fîl û hesp û gayan, giş li surha bajêr ketin, bi xwe re kunkirin an jî cîh bi cîh hilweşandin…

Taneyê asîmanî bi qoçên xwe yên hêzdar surha mayî herifand...Gilgamêş li Enkîdo nêriya, Enkîdo yekser rabû ser xwe, rahişt rumê xwe û derket trata cengê, ku bi taneyê hov re di pevçûnê keve, lê çi bike? Tane dîsa ûriya û bi dengê wî yê bilind re zevîn peqiya, û Enkîdoyê, ku di wan rojên çûyî ji aliyê jinan ve hatibû jarkirin, di qelîştekek zevînê re bi xarê ve çû, têwer bû, lê belê xwe şaş nekir, û bi lez destê xwe avêt rîşekî kevirî, yê dî jî avêt rehên darekê, ku dizevînê de wekî kêndiran belav bûbûn, xwe bi wan ve zemirand, xwe ji mirinê qurtal kir.

Taneyê asîmanî bi ser Enkîdo ve beziya, ku bi qoçên xwe yên xencerî li destên wî bide, Enkîdo ji nişka ve destekî xwe avêt qoçekî wî, û bi serîhildana tane re, ew bi banî ket, ji wê qelîşteka zevînê bi derket. Taneyê asîmanî seriyê xwe yê mezin gelek caran hejand, ku Enkîdo bavêje, zendên wî êşandin, nava wî êşand, hema Enkîdo jî bi hêz bû, û tevî wa êşa giran, ku bi hejandina seriyê tane re ketiye hinavên wî, ew hoşyar ma, deng li Gilgamêş kir, kire hawar…

Herdu mêran bi hev re alîkarî kirin, û li dawiyê taneyê asîmanî anîne xarê, gêr kirin, û Gilgamêşşûr da stoyê wî, dengekî wekî hurmîna ewiran gava li hev dikevin jê hat, xûna wî wekî lehiya çemekî çiyayî di zivistanê de rijiya, û laşê wî wekî surha kelehekê gava hildiweşe hate xarê, toz û kulxan ji ber rabû.

Iştara ku çavên wê tew bawer nedikirin li hêrs ket, di ser hinek zinaran re beziya, û bi ser Gilgamêş de qîriya, got:

„-Wey malwêrano Gilgamêş, te taneyê min ê asîmanî kuşt, te qoçên wî yên ji durreyê xiste nav toz û kulxanê, qey tu ji xudanê asîmanê natirsî?“

Enkîdo dest avêt qalçeyeke taneyê asîmanî, yê ku mirdar bûye, hilçirand û bi aliyê Iştarê ve avêt, rump li zinarê ket û xûn jê pijiqî. Enkîdo gote Iştar:

„-Ez bigihim te, ezê şeqên te jî wilo ji hev biçirrînim, ezê bi rovikên te dest û pêyên te girêbidim.“

Iştar bê deng ji wir çû, gelek keç û jinan li dora xwe civandin û bi xwe re anîn, hatin bi ser leşê taneyê asîmanî de giriyan, kirine hêlehêle, cilên xwe çirandin, xûna taneyê asîmanî li sîng û berên xwe hêştin, xulî bi ser seriyên xwe de rijandin, pêlik û biskên xwe birriyan û avêtin... şînayîyeke nedîd li dar xistin.

Gilgamêş û Enkîdo qoçên durreyî yên taneyê kuştî tijî zêta Zeytûnê kirin û ji pûtxaneya xwe re wekî diyarî pêşkêş kirin.

Pişt re çûn xwe di ava çemê Ferêt de şuştin, û di nav gelê xwe re bi heyteholeke mezin, bi şahiyeke şahanî hilkişiya nav koçk û serayên xwe yên bilind. Gelê Urûkê pir bi wan dilşad û serbilind bû, ku hem ji bajêrê xwe re kokên darên Erîzê ji Fînîqiya anîn û hem jî gel ji hêrişên hovane yên taneyê asîmanî azad kirin.

Gilgamêş bang li gelê xwe kir:

„-Kî ye mêrê tev bi hêz di cîhanê de?“

Bi hezaran deng bi hev re bilind bûn, û tenha yek peyv bû: „Gilgamêş!.“

(VI)

Efsane dibêje, ku ji ber kuştina Çûmbava, birrîna darên Erîzê, rezîlkirina Iştar a ku dota xwedîkê asîmanî Anû bû, û ji ber kuştina taneyê asîmanî, xwedîkên zevîn û asîmanê, zireyê û hişkiyê, tarî û rohniyê, giş li hev rabûn, bi hev re ketin gengeşê, lome ji hev kirin, û bi taybet di navbera Anû, Inlîl û Şamş de bû qîreqîr û hêlehêl. Her yekî yê dî kire tawanbar û histobar.

Yekî got ku bê Enkîdo Gilgamêş nedikanî tiştekî bi tenê xwe bike, û lew re pêwîste Enkîdo bimire, da Gilgamêş careke dî darên pîroz nebirre û sewalên pîroz nekuje, yê dî got ku pêwîste Gilgamêş bimire, ji ber ku Enkîdo ji xwe bê mejî ye, li çolê mezin bûye, tenha bi zik û navlingê xwe ve gêro bûye, û gava Gilgamêş bimire, ewê vegere çolistanê, û bi asik û pezkoviyan re, bi şêr û pilingan re bijî û li pey xwarina xwe ya rojane bigere, geyayê xwe bixuwe an nêçîra kêrguh û roviyan bike û bi asikan re li gan keve...

Li dawiyê biryar hate standin ku Enkîdo bimire û Gilgamêş bijî, da bajêrê Urûkê di saya hêza wî de nekeve bin zorbaziyeke hîn ji ya Gilgamêş mestir û pîstir.

Enkîdo xewneke nebaş dît, û ji tirsa re li ber xwedîkê xwe Şamş geriya, lava jê kirin û dilovanî jê hîvî kir, got:

„- Ey xudanê min, jîna min biparize, ez hejarekî çolê bûm, bi asik û pezkoviyan re diçêriyam. Ew nêçîrvanê bi dav û kemend neba, ez bi dav û xefka wê keçê nediketim, ez tew nedihatim Urûkê, min Gilgamêş nedinasî, û ez nedibûm rêheval û piştvanê wî di birrîna darên pîroz û di kuştina Çûmbava û taneyê asîmanî de..Heger tu dixwazî kesekî bersûc û tawanbar bikî, bila ew nêçîrvan be, û bila ew keçika xapînok û fêlbaz be, ku herduwan min girtin û xistin vê rewşê.“

Ji kûraniya asîmanê ve, an jî ji hinav û dilê wî ve dengekî bi hurmîn, ku newalan ewdeng veda, hate guhên wî yên bel bûyîne:

„- Ev Qedera te bû, lê te dikanî xwe ji dav û kemendan biparizî, heger tu bi ser wê jinê neketa û te sîrka viyana xwe nerijanda govdeyê wê. Tu bi pey dilxweziyên xwe yên hovane ket û te mala xwe bi seriyê xwe de herifand… Bo çi te wilo kir? Heger te xwe bi hêz nedîta, tu bi Gilgamêş re nedibû rêheval, tu tew nediçû Fînîqiya, û tu nedibû alîgê wî di kuştina bervanê darên Erîzê de… Bo çi te wilo kir? Heger tu bi zora xwe sermest neba, te bi Gilgamêş re taneyê asîmanî nekuşt û te qalçeya wî nedavêt ber lingên Iştarê… Bo çi te wilo kir?“

Enkîdo zer û lal bû, nedizanî çi bigota.

Dawî got:

„-Ma ez ne mirovim? Û mirov hemî jar in… “

Rabû çû ba Gilgamêş, dilê xwe jê re vekir û xewna xwe jê re hewalda. Got:

„- Min xewneke pir bi wate dît, min dît ku zevîn diqelişe û asîman digirî, hurmîna ewiran û lêdana birûskan ji her aliyekî min ve tên. Ji nişka ve tena mirovekî wekî ên Gonê derkete pêş çavên min, rûyê wî wekî yê firindekî û pepilên wî wekî yên pilingekî, dest avête min, û bi hêz ez ber bi xwe ve kaş kirim, ez di pença destê xwe de kirime tivîrkeke tirsiyayî, û ez di asîmanê re ber bi welatê tariyê ve hilgirtim, birim, ez ji zevînê firandim û ji Urûkê bi dûrxistim… Dora min bû tarî, û ez avêtim korteke tijî toz û xulî, êşeke berê nedîtî kete govdeyê min, û tirseke berê nedît dilê min girt… “

Gilgamêş hosan bû, tirsiya, ji kabê ve lerizî, ji cîh hilbû, di dora xwe re geriya û got:

„-Ev xewneke nebaş e… Ezê biçim pûtxaneyê, ezê qurbaneke mezin bo Şamş û Inlîl û Anû bibim û ezê li ber wan bigerim, da xeyda xwe ji ser me bibin, û heger dixwazin me tawanbar bikin, bila piçekî barê me sivik bikin… “

Di dema dayîna qurbanê û pêşkêşkirina nan û zeytê de bo pîr û berdestên pûtxaneyê, û gava Gilgamêş agirê herdemî bi kutikên ku ji kokên darên xurmê pêda kiribûn hêgin û gurr dikir, mîrê mirinê bûbû mêvanê Enkîdo, û di quncikê koçka wî de çavrêyê fermana asîmanî bû, da canê Enkîdo ji govdeyê wî hilçine û birevîne, bi xwe re bibe welatê tariyê û nemanê.

Enkîdo pir li ber xwe diket, ku ew ne li tratên ceng û pevçûnê ketiye ber şûr û xenceran, ew li ser doşeka mala xwe, wekî nexweşekî bê hêz, canê xwe ji dest dide, û nikane tiştekî bike. Bê berxwedan û bê têkoşîn canê wî yê ku ji her tiştekî bihatir bû, wilo bi asanî ji hinavên wî têye hilkirin, wekî tu çewa darekê ji zevînê hilkişînî, reh û damarên wê ji binî ve biçirrin û dawiya jîna wê bê.

Hişê Enkîdo li ber mirinê tev li hev bû, wekî gêj û serxweşan nedizanî çi dibêje, çi disapirîne…

„-Hey Enkîdo yê hov, ku bi asik û koviyan re mezin bûyî, ma çi bi seriyê te hatibû, tu wilo hate xapandin û tu bi pey qûna jinekê, orispiyekê, tolazekê ket, tu wilo bi hêza xwe serbilind bû û tu bi ber bayê ciwaniya xwe ket, tu bayî bû, û te bawer kiribû, ku tuyê herheyî bijî, herdem bimînî, û zora her kesekî bibî, xwe di ser tevan re bibînî? Qey te ji bîr kiribû, ku mîrê mirinê ji te û ji hemî mirovan bi hêztir e, temenê wî ji yê we tevan dirêjtir e, û ew her li pey we ye, ji we ve pir nêze, ji qirka we nêzîktire?...“

Enkîdo canê xwe ji dest da, di heft qatên asîmanan re canê wî hilikişiya, û wê pêncî hezar salên gerdonî bi jor ve, ber bi afirendarê xwe ve hilkişe… û Gilgamêş?

Gilgamêş wekî mirovekî, ku teviya kûzê mey vexwariye, serxweş bû, cilên xwe ji ser xwe çirandin û avêtin, di dor hev re wekî pilingekî, ku tîr li nava wî ketiye, di aliyê dî re derketiye û hinavên wî hatine çirandin, wilo birîndar û dilşikestî bû. Hêza Enkîdoyê ku ji wî re piştvan û rêheval bû winda bû, û baş dizanî ku Enkîdo bû qurbanê şaşî û çewtiyên wî. Wê rojê tew kesekî nediwêrî li Gilgamêş binêre an bi wî re bipeyive.

Termê Enkîdo bi gulav û misk û enberê şuştin, zêtkirin û bi gulan xemilandin, dane ser darbestek bi zêr û zîvan hatiye xemilandin, hildan birin, li ser girekî bilind danîn ser koka dareke hişkbûyî, da qertelên çolê goştê wî bixun, û hêzê jê bigirin, û pişt re gava goşt bi hestiyan ve nema, wê wan hestiyan bibin li pûtxaneya Urûk bi heyteholeke şahanî bisotînin, û wê xuliya wan hestiyan bibine bi ava Ferêt de berdin, da ber bi zireyê ve biçe û di avê de bite pişaftin… Wê rêç û şopên Enkîdo bên berşêkirin, wê hîç bermayeke wî li ser rûyê zevînê nemîne, ji ber ku cil û bergên wî, şûr û tîrkevan wî, wê bêne sotandin û helandin û di binê eytûna perestgehê de hetaheta hêzê bidine agirê pûtxaneyê…

Tenha wê navê Enkîdo li şûn wî bimîne, û weku dibêjin: Berf dih’ele zinar dimîne, ga dimire çerm dimîne û mirov dimire, tenha nav dimîne…

Bi berbanga roja dî re, Gilgamêş bang li hesinkar, zêrkar û pûtçêkiran kir, ku ji Enkîdo re pûtekî mezin ê ji zêr û baqirê, bi xemlên ji durreyê di navbera seraya şahanî û dergahê

pûtxaneya bajêr de avabikin, ku her yekê bêye seraya wî an biçe pûtxaneyê di ber pûtê Enkîdo re derbas bibe…

Heft roj û heft şevan li Urûkê bû şînî, jinan cil û bergêd xwe li meydanên bajêr çirandin, li sîng û berê xwe dan, bisk û pêlikên xwe birrîn, û xulî bi ser çavên xwe kirin û di ber wê yekê re, giriyan û lorandin, bi dengên ji sohtîn û wefadariyê dagirtî… û hercar, gava Gilgamêş ji seraya xwe ve li pûtê Enkîdo dinêriya, çavêd wî tijî hêsir dibûn û dikire heywax, heywax..

(VII)

Ji roja koçkirina Enkîdo ve, Gilgamêş xwe wekî şêrekî pîr dît, hêz û kanîna wî kêm bû, tirseke mezin kete dilê wî, û nema diwêrî bi tenê xwe bimîne… Lew re biryara xwe da, ku biçe ba Untapişto yê pîr, ku Xwedê ew û malbata wî, ji zorbaziya şahên xûnrêj paristibû, Xwedê temenkî dirêj dabû wî û bûbû hişmendekî bê wekanî, navê wî li gelek welatan belav bûbû, pir caran pîrên perestgehan, şehzade û rêvebirên mezin ên bajar û gundan dihatine ba wî, pirsêd xwe ji wî dikirin û şîretên wî digirtin… Hema ew pîre mêr li nişteki dûr bû, li welatê Godiyan dijiya…

Gilgamêş bi welatê Godî ve lezkir û çû, bê nan û bê av, bê peyrew û bê piştvan, gelek roj û şevan di welatê Mako re derbas bû, bi gelek hêzdaran re kete pevçûnên xûnî, lê hercar bi ser ket û rêya xwe bê westan gudand…

Li dawiyê ew giha newalên di binê çiyayê Godî de. Xwe li ser kaban berda ser zevînê û li ber heyvê geriya, û daxazên xwe kirin, ku ew bêye paristin û tirs ji dilê wî derkeve… Li wir di xew ve çû, û demekê li ber zinarekî ku wekî hovekî gir dixuya, Gilgamêş raza…

Roja dî, gava Gilgamêş çavêd xwe vekirine, di nav tîrêjên royê re pêjna du mirovan bi ber çavêd wî ket, lê ne wekî mirovin dî bûn, ji navê û jor ve mirovin rûqerêj û kirêt bûn, por dirêj, çavbeq û diranmezin bûn, yek jin û yek mêr, lê ji navê û jêr ve wekî dûpişkan bûn. Gilgamêş ji hinavê ve lerizî û tirsiya. Li paş wan deriyê şikefteke mezin hebû, ku hindirê wê tarî bû. Gilgamêş xwe girt û ji cîhê xwe rabû, şûrê xwe kişand û şûr li ber royê vebirîsî.

Herdu dûpişk-mirov keniyan, bi bayê kenê wan re şûrê Gilgamêş ji dest vepekî, şînginiya şûr li ser zinarekê hat. Dûpişk-mirovê mêr got:

„- Çi bi seriyên we mirovan hatiye, hema yekser hûn destên xwe davên şûr û debanên xwe? Ka bo me bibêj, tu li van çiyan li çi digerî, ma te kaxeza seriyê xwe winda kirî?”

Gilgamêş bi tirs li wî vegerand:

"- Ez rêwî me, ez dixwazim biçim ba pîrê çiyan, Untapişto, da ji wî hinek pirsan bikim."

Jina dûpişk gote mêrê xwe:

"- Bila em rê bidin vî kesî. Di vî mirovî de toveke Xwedayî heye."

"- Raste, raste... Xwedê mirov bo armancekê pêda kiriye, ku em tênagihinê, dibe ku di demeke pêş de tiştekî baş jê pêda bibe, hema ta niha ew hovekî xûnrêj û herifdarekî sirûştê ye, zevînê digemirîne, û nijadê xwe bi xwe qir dike... Bi ser dî gelek nijadên firind û sewal û cinaweran jî tune kirine."

"- Ev nijad wekî gêre û moriyan pir dibe, wekî mêşan belav dibe... Ewê rojekê teviya daristanan tune bike, çiyan biqulîne, zireyan qerêj bike û koka sewal û cinaweran bîne, ji wan tiştekî nahêle, tenha ji bo zarokên xwe wê ji her babetekê hindikan bihêle, da ji xwe re li temaşa bikin û pê bikenin."

Mêrê dûpişk gavekê ber bi Gilgamêş ve hat û got:

"- Başe, emê rê bidine te, ku tu bi ser oxira xwe ve biçî, lê hindirê vê şikeftê tarî ye, tê de marên ejderha hene, û rêyeke dî jê pêve di nav van çiyan re nîne."

Gilgamêş bersîv da:

"- Ezê bi zora baweriya xwe di tariyê re derbas bim, ezê bi hişmendiya xwe bigihim armanca xwe."

"- Heger mirov hişmend bana, hevdu wilo qir nedikirin... Here ji ber çavêd me winda bibe, berî em dîtina xwe diguhêrin û te parçeparçe dikin."

Wilo got, û Gilgamêş rahişt şûrê xwe ji nav axê rakir, û di nav herdu dûpişk-mirovan re, bi dilekî tijî tirs, xwe daqelazt û bi lez ber bi şikefta tarî ve beziya, tew careke dî li paş xwe nenêriya.

Demekê di tariya wê şikefta mezin re çû, ejderhayekî tofan, ku tenha çavêd wî wekî durreyan vedibirîsîn, derkete pêş Gilgamêş, ku wî bitirsîne û ji rê vegerîne an jî wî bavêje devê xwe û daqurtîne, hema ew bi lêdaneke şûrê Gilgamêş re bê serî ma, û li ber lingên Gilgamêş kilor bû, serî firiya çû li zinarekî ket û xûn jê pijiqî.

Gilgamêş di baweriya xwe de, ku ewê bigihe aliyê dî yê şikeftê, pir bi hêz bû, ew bi xwe bawer bû, û lew re li ser rêya xwe ma, çûyîna xwe tevî tirseke mezin gudand.

Ji nişka ve, tîrêjên royekê penca xwe avêtin ser çavêd wî, pelên darin wekî Yaqût û Eqîq û Erxewanê derketin pêş wî, hîskinî bi sîngê wî ket, û dizanî ku ew ji tariya şikeftê rizgar bû. Tiştekî wilo çeleng û xweşik nedîtibû, baxin behiştî, kaniyên avpijk, ku ji benên çiyayî ve

dihatine xarê û dikirine xumexum, gelek firind û asik û ajelên ku berê di jîna xwe de tew nedîtibûn. Bi ser ve jî berfa sipî, ku wekî kulehekî paqij seriyê çiyayê Godî pêça bû…

Di nav rezekî mezin re derbas bû, ku goşiyên tiriyê mêwan li ber rohniya royê dixuyan, her teneyek tirî wekî durreyekê, ku dilê mirov bi ser xwe ve dikişandin.

Gilgamêş destê xwe avêt goşiyekî tirî, şirtûveke ji sê teneyan jêkir, gava teneya yekemîn xistiye devê xwe û diranêd xwe lê dan hev, te digot qey kevçiyek hingiv bû.

"Gava mirov bi xwe bawer be, ewê di şikeftên hemî tengî û tariyan re derbas be"

Wilo di dilê xwe de got û berê xwe da royeke mezin û bi tîn, ku ji nav çiyayê Godî ve hildihat.

Gilgamêş di nav wa bihişta çiyayî re rêya xwe bi bakur ve bir, û di dilê xwe de li ser jîn û mirinê hizirî.

"-Gilgamêşo, tu ku ve diçî, di nav van çiyan re, te xwe wekî hirçekî bi van çerm û postên cinaweran pêçayî?"

"-Min jiyana xwe ta niha di lêdan û kuştin û talanê de derbas kir, pir xûn ji laşên kuştiyan bi ser rû û dest û lingêd min de pijiqî, lê ez di tariyê de bûm, û vaye ez gihame bihiştekê, û çavên min ji rohniya herheyî têr nabin… Ez dixwazim melevaniyê di nav tîrêjên royê re bikim, da ez bigihim qeraxên rastiyê, û ji hovîtiya xwe ya berê azad bibim."

Dibe ku ew pirsa Xwedayê wî yê mezin Şamş bû, ku ji nişka ve di dilê wî de wekî gupikek dara behîvê peqiya, dibe jî ew rast bi xwe li xwe hişyar bû, û cudahiya di navbera tarî û rohniyê de naskir. Lê xem nake, tiştê tev giring niha di vê çûyînê de ewe, ku mirov rêya xwe bibe serî, û carek dî venegere tariyê, nebe hovek û wekî berê nejî, zorbaziyê neke, xûna mirovan nerijîne, mal û dêrîna xelkê talan neke, çavan bernede jin û dot û xuhên wan, derewan neke, û xwe di ser mirovên dî re negire, û berî van rindiyan gişan, divê ew seriyê xwe li ber mezinahiya Xwedayê xwe, Xwedayê çerx û felekan, û yê hemî afirendan biçemîne, sermeziniya mirov, deselatgirtin, zêr û zîv civandin, dilovaniyê ji dilê wî tune dikin, wî ji mirovatiyê vala dikin, û wî bi hefsarekî ji zincîra namiroviyê li pey xwe kaşdikin, ji welatê rohniyê dibine welatê tariyê.

Gilgamêş giha ber kenarê goleke avê ya pir mezin, li wir dît, ku kêzikek mezin digere û zirxê pişta wê ji zêr e. Kêzikê seriyê xwe ber bi Gilgamêş ve bada, rûyê wê wekî yê mirovekî sedsalî pîr xuya bû. Gilgamêş gote kêzikê:

"- Kêzok, bo çi di rêya min de rawestîyî, tu nahêlî ez rêya xwe bibime serî? Tu kîyî?"

"- Ez kêzika piştzêrîn im, ez li rizqê xwe digerim, lê tu kîyî, ku tu wekî mirovkujekî bi şûr û tîrkevan, bi gopal û kevirkanîk li nav va bihişta aşt û xweşik digerî?"

"- Ez Gilgamêş im. Min taneyê asîmanî, ku xudîyan bo herifandina bajêrê Urûk şandibûn kuşt, min Çûmbava yê ku ji xudiyan re li ber daristanên Erîzê kuşt û min kokên darên Fînîqiya anîn, ji koçk û seraya xwe re kirine stûn û hilgêr."

„- Heger rast tu Gilgamêşê bi nav û dengî, bo çi rûyê te wilo xemgîn dixuye, çavên te wekî yên kesekî ne, ku kurê wî li ber wî kuştîne, û tu wekî rêwiyekî rêwinda dixuyî, bo çi tu ne xweşiyarî, heger rast tu wilo bi hêzî û Gilgamêşê serkeftîyî?"

„- Başe, başe, kêzika piştzêrîn, niha ji min re bibêj; ez çewa biçime ba Utnapîştoyê hişmend, ez dixwazim ji wî fêr bibim."

„- Diyare tu tew ne amadeyî carekê di nînikê re li rûyê xwe binêrî û bibînî, ka tu çi hovî, tu çi namirovî. Tu tew nikanî bi paş ve binêrî, da tu jiyana xwe ya berê vekolînî û jê fêr bibî… Diyare tu ji siya xwe ditirsî!"

„- Hevrêyekî min î pir dilsoz hebû…"

„-Êh!"

„- Enkîdo. Min ji wî hezdikir, wekî birayekî xwe. Me bi hev re wan serkeftin bi dest xistin, me bi hev re navê Urûk bilindtir kir û hêriş ji ser şikandin. Ew mir. Min û teviya gelê Urûkê, heft roj û heft şevan, me bi ser wî de kona şîniyê vegirt, kesek li Urûkê nema, ku bi ser Enkîdo de negiriya. Ji wê rojê ve, ez li xwe hişyar bûm, ku kenarên jînê digihin yên mirinê, ku di navbera zindî û miriyan de dîwarekî bilind, surhek herheyî û çiyayekî ji pola heye, ku kesek nikane têre derbas be û gava ew derbas bû, nema dikane vegere… Min çendî bang û gazî li Enkîdo kirin, ew venegeriya, û ez baş dizanim, ku çi caran wî gotina min nedişikand, heger kanî ba vegeriya, wê bersîva banga min bida. Di navbera me da nan û xoyê hebû, em destbirakên hevdu bûn, em hevrêyê hevdu bûn… Em bê hevdu çi caran bi ser nediketin. Enkîdo, destê xwe ji hemî xweşikiyên koçk û serayên Urûkê kişandin, wan keçik û zeriyên sipehî, wan xwarinên bihiştî, wan zêr û zîv û durreyan, wan hesp û mehînên kumêt, û wa rûmetdariya bilind a deselata Urûkî, tev li şûn xwe hêştin û berê xwe da welatê neman û tunehiyê…"

„- Ev gola mezin a ku tu li ber xwe dibînî, gola mirinê ye, destpêka navegerê ye, çi mirov nikanin di ser pêlên vê golê re bê rêdayîna Xwedê biçin, tenha Şamşê bi hêz, her roj di ser pêlên wê re ber bi rojava ve tîrêjên xwe davêje, û hêdî-hêdî gavdike… Ji bo derbasbûna di ser pêlên gola mirinê re, ji te re harîkariya masîvan û keştîkarê Utnapişto pêwîste. Ewe jî niha li daristana hanê, li keveroşkan digere."

„- Ew çi kese?"

„-Navê wî Urşanavî ye. Ew melevaniyê dizane û dizane te çewa bibe ba Utnapişto, pîrê Godîyan."

„-Godî çi mirov in?"

„-Xweda ji Xod û God hatiye, Godî jî wan mirovin, ku bi Xwedayê tenha, yê zevîn û asîmanan, yê tilûr û firindan, yê çem û zireyan, yê mirov û cinaweran, û yê hemî gerdonê, bawer dikin."

"-Kêzika piştzêrîn, ma tu jî bi Xwedê bawer dikî?"

"-Ewê bi Xwedê bawer neke, her wekî mirovekî çavkûr ê rewinda ye... Min jî çi caran rêya xwe winda nekiriye."

"-Min pir caran rêya xwe winda kiriye, ez ji çalekê di yeke dî werdibûm, hema ez li rastiyê digerîm, min berê xwe daye ronahiyê, da ji tariyê azad bibim..."

„-Mirovo, te ewqas xûn rêt û tu fêr nebû, te ewqas zorbazî kir, tu fêr nebû, te ewqas talan û malrevandin kir, tu fêr nebû, û te ewqas deselatdarî kir, û tu fêr nebû, tuyê bi du gotinên pîremêrekî çiyayî, ku tenha wekî darbesteke ji hestiyan dixuye, fêrbibî? Tuyê fêr bibî çi? Yek fêr dibe da şaşiyan neke, ma hîn çi şaşî maye, ku te nekiriye? Çi terzê cinaweriyê hîn maye, ku te nekiriye?"

„- Ho kêzika piştzêrîn, te ez niha fêr kirim pir tiştan, û gava tu ji min re bibêjî, ka ez çewa biçime ba pîrê hişmend Utnapişto, ezê teviya jîna xwe ya mayî berxwedariya te bikim."

Wilo got û xatirê xwe ji kêzika piştzêrîn xwest, û çû li keştîkar û masîvanê Utnapişto bigere.

Paş kurtedemekê Urşanavî ji nav daristanê derket hat, û di destekî wî de du kêrguhên kuştî, seriyên wan bi jêr ve, dihejiyan û çilpikin xûnê jê dadirivîn.

Gilgamêş gotê:

"-Were min di golê re bibe ba axayê xwe Utnapişto."

"-Tu kîyî, ku ez te bi keştiya xwe bibime ba axayê xwe?"

"-Ez Gilgamêş im."

"-Gilgamêşê xûnrêj?"

"-Vaye tu ji min neçêtirî, ma gunahê van kêrguhan çi bû, ku te ewana kuştine?"

"-Min du kêrguh kuştine, da ez wan ji xwe re bikime xwarin, te bi sedan mirov kuştine, û goştê wan naye xwarin... Em wekî hevdu nabin."

„-Ez niha ji kêzika piştzêrîn fêr bûm, ku mirovê ji sirûşt û cinawiran hezneke, mirovekî bê wijdane, zorbaze û bê dilovanî ye....Ewê dilopek xûn birêjîne, wê çemekî ji xûnê jî pêda bike..."

„-Ha…ha…ha…Gilgamêş destên xwe ji xûnê taze şuştine, û hatiye min fêr bike dilovaniyê….Here, ez ne amade me harîkariya xûnrêjekî wekî te bikim.“

Gilgamêş xeyidî û dest pêkir perrikên keştiya wî yekûyek şikandin. Masîvanê ku bi du çavin beloqbûyî li wî dinêrî û govdeyê xwe yê girs bi ser parçeyên wan perrikan de duta kiribû, ji navê ve lerizî û got:

„- Başe, başe, te niha keştiya min bê perrik û basik hêşt. Were bi min re nav daristanê, û bi destên xwe ji xwe re keleka xwe çêbike. Ezê te fêr bikim.“

Gilgamêş da pey Urşanavî û çû nav daristanê, wekî wî jêre gotiye, dest bi birrîna kokên darên Çinar û spîndarê kir, bi şivên qamîşê û yên mêwên Dirîreşkên ber avê jî ewana giş bi hevxistin û girêdan, bi harîkariya Urşanavî ew kelek daxist nav golê, û li ser wê suwar bû…

Berê mirov ji zireyê „behrê“ ditirsîn, wan bawer dikirin, ku di binê wê de ejderhayin mezin hene, gava xwe dilivîn, pêl pêda dibin, û lew re zire bi tevayî diheje…Gilgamêş ji ber bihîstina wan çêrokên kevin di zarokiya xwe de, wekî mirovên dî di wê baweriyê de bû, ku ejderhayê di wê golê de jî xwe pir dilivîne, û lew re di bin keleka wî de pêlên avê ewqas bilind dibin. Dilê xwe yê ku zûzû lêdida, girt, çavên xwe ji pêşiya xwe neguhartin, da li pêlên avê nenêre û tirs dilê wî nerevîne. Bêdeng û bê ku carekê li dora xwe binêre, ber bi pêş ve keleka xwe ajot. Li pêş wî dawiya golê ketibû bin perdeyeke qalinga mij û dûmanê, ku ew zire hîn nenastir û tirsavêj dikir.

(VIII)

Li ber kenarê golê yê dî pîrê çiyan Utnapîşo rawestiya bû û bi çavêd xwe yên ku rohnî têde vemirî bû, li serlêderê nû temaşa dikir.

Gelo, ev çi kese? Ji ku ve tê? Çi dixwaze? Qey ew jî wekî şah û xanedanan hatiye li ava jînê digere, dixwaze her bijî, tew nemire?...

Gava Gilgamêş lingên xwe avêtin ser hişkiyê, di ser qûma nerm û germ re ber bi pîrêmêr ve çû, pîremêr bi dengekî zirav û nizim got:

„- Ez Utnapîşto me, tu kîyî û tu li van deran li çi digerî?“

Gilgamêş xwe li ber Utnapîşto li ser çogan berda erdê, seriyê xwe çemand û got:

„- Ez Gilgamêş im. Ji pişt û nijadê Anû, Ênlîl û Şams im.“

„- Gilgamêş? Ma kê hîn navê te nebihîstî, tu yê di dîroka mirovatiyê de mîna nîşaneke hovîtiyê her bimînî, mirov wê pişt bi pişt, nijad bi nijad, çêroka te bînine bîra xwe û ji zarok û nevîyên xwe re bibêjin, çêrokbêj wê paş hezaran sal ji vê rojê te ji xwe re bikine bingeha fantaziyê, hinek bi zanayî wê li ser jîna te, li ser karên te û li ser jarbûna te binivîsin û bipeyivin, lê wê hinek jî bê zanîn te bikine qehremanekî mirovatiyê û wê ji te re bibine pesindar. Tu yê bimirî, hestiyê te wê birizin, ji xuliya te pê ve tiştek namîne, lê navê te ji deftera dûrokê nakeve.“

„-Ez hatîme ji te fêrbibim. Li ser jîn û mirinê…“

„-Her car tu gavekê di jînê de davêjî, tu gavekê di nav zeviyê mirinê re jî davêjî. Mirin û jîn her bi hev re ne, herdem û li her derekê. Gava Xwedê tova jînê xistiye canê mirov, bi wê re tova mirinê jî xistiye di ber de. Çi mirov herheyî nabin, û em tev dimirin, hema di navbera jidayîkbûn û mirinê de demek heye jê re „temen“ dibêjin. Mirov di ber temenê xwe de berpirse, û gava dimire, pişt re tê ber pirsê, li ser du tiştan pirs ji wî tên kirin: Temenê xwe bi çi derbas kir. Ewa dema giran biha, ku tê de jiyaye bi çi qedand, û pirsa dî jî ewe, ka wî malê xwe ji ku anî bû, ku ve bir, bi çi şêweyê ew pêda kiribû û çi pê kir.“

„- Dostê min Enkîdo ku mir û ji ber çavên min berşê bû, teviya jîna xwe xiste berdestiya deselata min.“

„- Heger deselata te baş be, jîna wî an temenê wî, ku di berdestiya wê deselatê de derbas kiriye, wê mîna qenciyeke dirêj ji wî re bite jimartin, lê heger deselatiya te nebaş be, wê temenê wî, ku di ber te de di pevçûn û xûnrêjiyê de derbas kirî, mîna neqenciyê bite jimartin.“

„- Ma gunahê wî çiye, wî berdestiya min dikir? Ma ne xudîkên erd û asîmanan her tiştekî bi ya dilê xwe dikin?“

„-Na..na..Mirov azad e û di ber kirinên xwe de berpirs e. Heger mirov xudan hiş be hêza xwe nake berdestiya zorbazan. Pişt re tu bo çi dibêjî: Xudîkên erd û asîmanan? Ji Xwedê pê ve çi xudîkên dî nînin. Xwedê yek e, tenha ye, ne ji dayîk bûye û ne kesek ji wî pêda bûye…Van xudîkên dî, we hemî ji xwe re ji fantaziya xwe pêda kirîne, yek bo bahozê, yek bo baranê, yek bo royê, yek bo zireyê… û her weha..We ji wan re jî hîm û pût pêda kirîne, û bo pûtperestiyê we pûtxane û agirxane pêda kirîne. Pir caran firind di ser wan re difirin û zelqê bi ser seriyên wan dikin, lê dîsa jî evdên pûtperest hişyar nabin û dev ji wan kevir û

textan bernadin… Dibêjin, ku li ba netewekê di pûtperestê de bêtir ji sêsed xudîk hene, bo her êleke wan xudîkek heye, û dibêjin, ku carekê mirovekî ji wan xudîkek ji xurmê pêda kiribû, rojekê ew bi rêya xwe ve diçû, û birçî bû… "

„-… Erê, ez dizanim tuyê çi bêjî! Rabû xudîkê xwe ji têrê derxist û xwar."

„- Rojekê wê Xwedê kesekî ji nav wan pêda bike, ku wan hemî pût û hîman ji perestgehê bavêje û wê bo Xwedaperestiyê paqij bike..."

Diwê navê de, ewana bi hev re di ber kenarê golê re çûn û gihane ber zincekê ji dar û keviran, ku di nav de pîrejinekê nan dipija.

Gilgamêş pirs kir:

„- Ev pîrejin hevmala te ye?"

"-Erê, paş lehiya mezin min ew li xwe mar kir û niha heft zarokên me jî hene."

"-Lehiya mezin?"

"- Erê, gava nebaşî, pîsîtî û neyartiya Xwedê li welatê me pir bûye, Xwedê ferman da min, ku ez keştiyekê ji daran çêbikim, malbata xwe, mirovên qenc û hêja yên bi Xwedê bawer dikin, û ji her babeteke sewalan, firind û cinaweran, cotekî bi xwe re hildim nav keştiyê… Gelê min ji xwe re henek û tinazî bi min û bi keştiye min kirin. Ji nişka ve ewir civiyan, bû bad û bahoz, bû firteneyek baranî ya pir bi hêz, ro nema dihate dîtin, bû tarî… Te digo; qey asîman kun bû, baraneke bê wekanî bariya… Min gote kurê xwe: ‚Were bi min re, berî lehî me dide ber xwe û bi xwe re dibe.' Gote min:'Na..Ezê birevime ser çiyayekî, lehî nagihîne min… ' Bajarê me tev li ber lehiyê çû, û Xwedê em ên bawermend û bi me re cinawer, firind û sewal ên ku min berê civandibûn û di keştiyê de bi cîh kiribûn ji mirinê rizgar kirin. Me di çiyayê Godî de gundê Heştaniyan avakir û me jîna xwe di aştiyê de gudand."

Paş du rojan, ku bi hev re di pirs û bersivdanê de derbas kirin û bi goştê masiyên biraştî, ku Urşanavî ji wan re di golê de digirtin û bo wan amade dikirin, debara xwe kirin, Gilgamêş gote Utnapîşto yê pîr:

„-Pîremêrê navbilind, şahêmin ê mezin, azaran bide min."

„- Gilgamêş, li xwe hişyar be, jiyan wilo tehl û tirş e, bi xem û kule, weku ji aliyekî dî ve hingivîne, şirîne… Gava mirov hatiye pêdakirin, tova mirinê di wî de hatiye çandin. Ew ji xuliyê hatiye pêdakirin û wê vegere bibe xulî. Gava termê mirovekî tê sotandin, li dawiyê tenha ji wî hestî dimînin, yê dî jî xulî ye, wan hestî hêdî-hêdî dipişifin û dibine xulî… Gava tu gora mirovekî ji zû ve miriye bikolînî, tuyê ji xuliyê û hestiyan pêve tiştekî nebînî… Kî dibe, bila be, çi şah û qeyser, çi evdal û çi rêncber… Gilgamêşê nezan û dil tijî xem, vegere here welatê xwe, biçe Urûka xwe ya xopan, û jîna xwe bigudîne, bi ken û nazinîn, bi xweşiyarî û

hilperkîn, ta roja xwe ya dawî… Mirov pêda bûye, ku bijî û bimire, bikene û bisoje, bikeve û rabe, bixebite û rakeve, û berî her tiştekî, divê ew hezbike, ji sirûştê, ji sewal û firind û cinawersan, ji req û beq û kosî û masiyan, ji mirovên wekî xwe, çi reş û çi sipî, çi zana û çi nezan, çi jin û çi mêr… Mirovê, ku di dilê wî de hezkirin nîne, dilovaniya wî jî nîne, û ewê bê dilovanî zorbaz e, ewe cinawer, ewe hovê, ku pêwîste ji nav mirovanbite cihêkirin, û di binê zindanan de bi zincîran bite girêdan… Here, vegere mal xwe, û agirekî şahanî yê pir gurr û hêgin dade, da hemî xelkê Urûkê bibîne, û şahiyeke mezin, bi dehol û zurne, bi hilperkîn û sema, bi dîlan û govend li dar xîne, bi sedan pez û gay û gamêşan serjê bike, bila teviya gelê te goştê wan li hev parbike, bila kesekî birçî li memleketa te nemîne, dadî û wekheviyê pêda bike, û kê xwe li te girt, da giliya xwe li ber te bike, baş guhadriya wî bike, û bersîveke dadmend bide wî… Pir caran ezezî û sermezinahiya rêberê neteweyekê dibe egera binvebûn û têkçûna wê neteweyê, û pir caran bêdengiya wê lihember zorbaziya wî deselatdarî dihêle ku ew hîn zordartir û hovbaztir bibe, wan û welatê wan biherifîne… Sermezinahiyê, xwedîtiyê û quretiyê ji ser xwe bavêje, weku tu kurk û kirasên xwe ji xwe dikî, berî tu xwe bavêjî nav çemê Ferêt û avjenînê têde dikî. Ewên sermezinahiyê di zevînê de dikin, bila baş bizanin, ku çi dar negihane asîmanan, û li dawiyê seriyê her yekî ji wan tê çemandin, deselatiya wî ji destê wî diçe û poşmanî dil û mejiyê wî wekî kurmê koka dara Zytûnê, ji hindir ve diherifînebila jiber quretî û sermezinahiyê di pelikên mayî de ji deftera jîna te zorbaziyek dî neyê nivisandin, lora ku ji zorbaziyê mestir tawanbariyek nîne, Xwedê her gunahekî dibexşîne, hema zorbaziyê nabexşîne û nabe tu ji bîr bikî, Gilgamêş…"

„- Çi?"

„-Nabe tu ji bîr bikî, ku Xwedê çi hevparan ji xwe re napejirîne."

"- Ez dixwazim li ba we bimînim û bi te re herime gundê Heştaniyan. Ez nema dixwazim vegerim Urûkê û li wir zorbaziyê bikim."

"- Gundê me kesekî, ku seriyê xwe ji pût û hîman re diçemîne nahêle nav xwe. Ya baştir ewe, ku tu vegerî nav gelê xwe û tu deselata xwe ji binî ve biguhêrî, tu dadiyê pêda bikî, û gelê xwe bînî ser rêya rast."

"- Başe, ez hatim ji te fêrbibim jîna herheyî, tu min vedigerînî nav hovîtiya gelê Urûkê."

"- Ji ber ku tu di ber gelê xwe de berpirsî, tu deselatdarî, û her şivanek di ber pezê xwe de berpirse. Jîna herheyî ewe, ku ewên li pey te dimînin di saya Xwedê de baştir û hêjatir bijîn, û pesindariya qenciya te bikin… û mirin ewe, ku ên li pey te dimînin, her roj nifirînê li te bikin û ji hev re li ser neqenciya te bipeyivin."

"-Tu çi ji min dixwazî, ez bikim?"

„-Here deholekê bi histoyê kirîfekî xîne, bila ew di nav bajêrê Urûkê re bigere û bi lêdana wê deholê şeryar û neqencan ji bajêr qorî bike."

Wilo got û ji jina xwe xwast, ku heft nanan bide Gilgamêş, da bi rê ve birçî nemîne, bi wî re jî harîkarî kir, ku li kelekê suwar bibe û ji nû ve di gola mirinê re, ber bi welatê Urûk ve vegere.

Di rê de, Gilgamêş bi dirêjî li ser peyvên Utnapîşto û li ser keştiya wî û lehiya mezin hizirî, çû cîhaneke nû ya ronahiyê û di dilê wî de pirs li pey pirsê pêda bûn, li ser jînê, mirinê, baweriyê û li ser egera pêdabûna mirov... Lê tiştê ku baş nikanî ji ser hev derxista gotina Utnapîşto yê pîr li ser deholê bû. Bo çi wî gotê: Here deholekê bi histoyê kirîfekî xîne, bila ew di nav bajêrê Urûkê re bigere û bi lêdana wê deholê şeryar û neqencan ji bajêr qorî bike???

Gava Gilgamêş gihaye aliyê golê yê dî, seriyê xwe pak şuşt, çend zêr xistine destê Urşanavî û kete rêya xwe, çû. Paş hinde gavan carekê li paş xwe nêriya, dît ku Urşanavî li pey wî ye, jê pirsiya:

"- Bo çi tu bi pey min ketî? An jî tu bi ser oxirek xwe de diçî?"

„- Ez dixwazim bibim peyayê mirovekî wêrek ê mîna te. Tu pehlewan û pilingî, lê dîsa jî tu ji bo nasîna rastiyê ji welatê xwe yê dûr hatî û di gola mirinê re derbas bûyî."

„- Dest di ser destan re hene, ta bi mala Xwedê. Min xwe pir piçûk û nezan û jar dît li ber Untapîşto yê pîr."

„- Mala Xwedê? Ma Xwedê di malekê rûniştî?"

„- Na... Mebest ew mala ye, ku têde Xwedê tê perestin, ne pût û hîmên kevirî an ji daran çêkirî."

„- Diyare serlêdana te ji Untapîşto yê pîr re bi berhem û mifa bû."

„- Erê... Gelek. Lê te bo min negot; tu çewa Utnapîşto hêla û tu bi min re hatî."

„- Na, min ew nehêlaye... Wî ji min xwast ez bi te re biçim, da ez mîna Enkîdo ji te re bibim piştvan û hevrê."

(IX)

Di rê de, paş demekê hatin ser avekê, ku gelek fireh û kûr bû. Urşanavî gote Gilgamêş:

„- Di binê vê avê de dara gulekê heye, ku pir bi histirî ye, û destên mirov birîn dike, gava yek kanibe dakeve binê avê, gulekê ji wê darê bike û wê gulê bixu, ewê ser ji nû ve ciwan bibe... Lê gava ew birîn bibe, wê marmasiyê hov bi zûkî bihna xûna wî bike û hêriş ser wî bike, derketina wî ji binê avê nema bi çêdibe.“

„- Ev çi çem e, navê çem çiye?“

„- Çemê Avşînê.“

„- Ez diherim wê gulê tînim.“

Wilo got û kurkê xwe ji xwe kir, bi her lingekî xwe ve kevirekî giran girêda û xwe ji ser zinarekê ve avête nav çemê Avşînê. Bi zûkî ew bi binî ve daket, ji ber ku kevirên giran ew bi xarê ve kişandin.

Rast wî dareke bi gelek histirî yên wekî şûşjinan dirêj û tûj dît, di nav de hinek gulên sipî û pelmezin hebûn. Bi lez destê xwe avête gulekê û jêkir, histirî ji herdu aliyan ve li zendên wî qelibîn, xûn jê pijiqî, û ji nişka ve di kûraniya avê de marmasiyekî pir mezin, dev bi diranên wekî xenceran tûj û dirêj, xwe livand û ber bi wî ve hat, ava çem herimî û çeliqî, li ser avê pêl pêda bûn.

Gilgamêş bi lez kevirên bi lingan ve girêdayî bûn avêtin û bi jor ve wekî tîrekî hilkişiya. Urşanavî yekser guman kir, ku marmasî yê hov li Gilgamêş hişyar bûye, hema beziya çend kevir ji dor xwe rakin, yek û yek avêtin dora Gilgamêş, ku marmasî ji wî qorî bike. Berî marmasî xwe bigihîne Gilgamêş, Gilgamêş xwe gihande kenarê çem, bi qeramekî dirêj girt, û bi zûkî xwe bi hişkiyê xist. Marmasî dev avêt wî, ku wî bigire, hema li şûna wî kevirekî mezin ê ku Urşanavî avêtiye, kete nav diranan, û gava wî bi hêz diran lê dane hev qîjiniyek jê hat û seriyê xwe bi jêr ve daxist, xûna ji devê wî pijiqiye ava di ser seriyê wî re sor bû.

Gilgamêş gote Urşanavî:

„-Te jîna min ji mirinê rizgar kir. Vaye gula jîndariyê ji te re, te ew li xwe maf kir.“

„- Bira, qey te rast bawer kirî, ku ez dixwazim herheyî bimînim. Na..na..Min jîna xwe baş derbas kir, ji ber ku ez her bi wê dilxweş bûm, çendîn tehl û tirş ba, ez ji ber dilteng nedibûm, çiqas hejarî û zêwirî, tenahî û bêparbûn ji malê cîhanê, dîsa ez mam wekî berê, dil tijî hêvî û şadî... Ma ez careke dî ciwan bibim, ezê çi bi ser xînim? Gulê bi xwe bixu an bibe ji kesê ku tu pir jê hezdikî, da ew pê ciwan bibe.“

„- Ji dayika min bihatir kesek li ber dilê min nîne.“

Wilo got û gul xiste tûrikê xwe.

Paş du rojan di rê de, herdu mendo bûn, westiyan. Gilgamêş tûrik û kurkê xwe danîn û seriyê xwe da bin avekê ku ji beneke bilind ve dihate xarê û dikire xumexum, seriyê xwe şuşt, û Urşanavî jî çû hinek masî ji goleke avê bigire, da bibirêjin û bixun.

Marekî bihna gulê kir, bi dizîka û bêdeng xwe xuşand û hate ber tûrikê Gilgamêş, seriyê xwe xiste di nav de û gul xwar. Ji nişka ve ew ciwan bû, û gava Gilgamêş serşuştina xwe teva kirî, dît ku çermê kevin ê mar li şûn maye, hîngê xeyidî û bi ser Urşanavî de qîriya, hema çi mifa ji wê xeydê? Gula ciwaniyê, jîndariyê û nûkirina jînê çû, kete zikê marekî çol û beyaran.

Hinek roj dî derbas bûn, surha bajêrê Urûk ji dûr ve ber bi çavên wan ket, û Urşanavî yê ku ji zû ve bajar nadîti bûn, mamtmayî ma, êdî nema dikanî çavên xwe ji wa surha mezin û li ber roya ku diçû ava, biguhêre. Wan rengên sor û mor mejiyê wî hejandin û hişê wî revandin. Gilgamêş gotê:

„- Eve ji derve de şirîn û ciwan e, ji hindir ve hîn şirîntir û ciwantire, tu yê perestegeha mezin bibînî, tu yê xemla Iştar bibînî, û tuyê pûtên Inlîl, Anû, Şams û Enkîdo bibînî, hîngê tu yê bizanî Gilgamêş çi deselatdar e.“

„- Vaye min tu gihand ber bajêrê te Urûk, gava tu di dergahê re derbas bî, ezê vegerim herim ba Utnapîşto yê pîr, ji ber ku histobariya min çû serî û tu vegeriyayî welatê xwe, lê wekî ez dibînim, tu hîn Gilgamêşê berê yî, tu hîn bi pût û hîmên xudîkên xwe serbilindî, tu nehatî guhartin.“

Gilgamêş carekê kûr li hevrêyê xwe nêriya û got:

„- Gava ez wan biherifînim, ma wê gelê min serî li min hilnede? Ka ezê çewa kanibim baweriyê bi vî gelî re çêbikim, ku van pût û hîmên wan bê mifa ne, û tenha Xwedayek î li ser hemî gerdonê deselatdar e, ku ji wî pêve çi xudîk nînin, û ew jî bi çavan naye dîtin û bi hişan naye wênekirin?“

„- Raste, ev ne karekî asan e, lê mêranî ya tev hêzdartir di vir de ye.“

„-Ezê roj bi roj di nav gel de baweriya yekxwedayî belav bikim, da ez bi tenê xwe nebim… Ezê hêdî-hêdî ya xwe bi ser xînim...“

„-Karê te wê ne asan be, mixabin ji min hatiye xwestin, ku ez te bigihînim ber dergahê bajarê Urûk û vegerim herim melevanî û masîvaniya xwe bikim… Dibe ku ez bi te re derbas bim nav bajêr û di bin basikên tariya bêbaweriyê de winda bibim, an jî vegerime pûtperestiya berê…“

Paş wê gotinê, nema bi hev re peyivîn, û gava ewana gihane ber dergahê Urûkê Urşanavî rêya xwe guhart, û di dilê xwe de got:

„-Rêya min û ya gelê Urûk ji hev verê dibe, çavên min ên li ronahiyê vebûne, nema ez bi tariyê kildidim…“

Wilo got û ser ji nû ve ber bi welatê, ku jê hatî ve çû, ber bi welatê Godîyîn, ku li wir pût û hîm tev hatibûn şikandin, pûtxane hatibûn herifandin û tenê navê Xwdayê zevîn û asîmanan dihate bilindkirin.

Gilgamêş bi dilekî xemgîn di dergahê re derbas bû bajêrê xwe, û tew nizanî çi bêje an çi bike, bo wî her tiştek, her kesek û her derek nenas bû.

(X)

Ji zû ve, jineke sihirbaz bi navê Inana hebû, ku nevîna gelê Urûkê dikir, û her û her bizavên xwe dikirin, ku ziyaneke mezin bigihîne wî bajêrî, ji ber ava Ferêt şitlê dareke hov, ku jê re digotin Dara Şeryar anî bû û li meydaneke bajêr çandi bû. Dem û sal derbas bûn, ew dar mezin û gir bû, lê her û her tirs davêt dilê mirovan, nevîna wê dikirin û dixwestin wê bibirrin an jî bisotînin, hema pir ditirsiyan…

Ji aliyekî ve ew dara bi destê sihirbazeka şeryar hatibû çandin, û ji aliyekî ve jî mirov ji Dara Şeryar ditirsîn, digotin ku wê ji kûka wê xûn birije, heger mirov wê bibirre. Inana bo paristina dara xwe marekî tofan jî wekî parêzer û bergêr danî bû, ew mar roj bi roj qelewtir û dirêjtir bûbû, fîşefîşa wî bû, û ji tirsa re xelkê berxik û karik dihanîn davêtin ber wî, da birçî nemîne û hêriş wan neke. Dayikan zarokên xwe bi tirsandina ji wî marî dikirine xewê, lê ewana hîn ji zarokan bêtir ji mar û ji Inana sihirbaz ditirsîn.

Gilgamêş roj bi roj, û pir bi dizîka dij bi pûtxaneyê û pîrên wê, di nav peyrewên xwe yên tev nêz de li ser Utnapîşto û fêrkirinên wî peyivî, û nema careke dî qurbanî li ber pûtan danîn…

Berê ew jî wekî her mirovekî Urûk bû, tevî ku leheng û pir wêrek bû, nediwêrî Dara Şeryar bibirre an bisotîne, ji ber ku baweriya wî jî wekî ya teviya gelê wî bû, lê paş ku ji ba Utnapîşto vegeriya, wekî kesekî dî bûye, nema tew bi pût û hîman bawer dike, nema ji pîr û bergêrên pûtxaneyê ditirse, û nema ji Dara Şeryar ditirse, û lew re biryara xwe da ku here wê darê ji kokê ve hilke, reh û damarên wê ji zevîna Urûkê rakişîne, da ew carek dî şîn nebe.

Gilgamêş gote diya xwe:

„- Dayê, ez Dara Şeryar tune dikim.“

„-Kurê min î hêja, gava tu dara Şeryar bibirrî, wê lehiyeke ji xûnê ji koka wê birije, gelê Urûkê wê bitirse û wê di bin zora baweriya xwe ya olî de serî li te hilde.“

„- Dayê, ev çêroka xûnê, ku ji koka darê dirije, wilo hatiye ristin û pêdakirin, da kesek darên wilo kevnare nebirre.“

„- Ez nizanim. Lê ez dizanim, ku gava Inana sihirbaz û pîr bibihîse, wê daveke sihirê ji te re birêse û wê tola xwe ji te hilde.“

„- Başe, ezê berî her tiştekî dayîka şer ji bajêr bavêjim, ez ê wê di xew de bigirim, dest û pêyêd wê bi zincîran girê bidim û ji surha kelehê ve bavêjim newalê bêbinî yê ku ta niha kesekî têwer bûye carek dî jê derneketiye.“

Wilo got û ramûsî destê dayika xwe ya pîrbûyî û ji ba wê derket, di dilê wî de baweriyek xort bi xwe û bi rastbûna biryara xwe pêda bû.

Di wê şevê de, Gilgamêş zincîreke hesinî ya qaling û giran hilda ser milê xwe, û bi dizîka hilkişiya razanga Inana, ku ji surha kelehê ve ne dûr bû, di pencereyeke vekirî re derbas hindirê maxê bû, ji nişka ve ew girêda û hilda ser milê xwe, ber bi surhê ve beziya û ji jor ve avête newala bêbinî, ku di binê surhê da bû, qîrêneke hov ji sihirbazê hat û Gilgamêş got:

„- De here ciyê tu jê hatî, Inana şeryar.”

Di rêya vegerê de, Gilgamêş di dilê xwe de wilo dihizirî: “-Wê di dîrokê bêjin ku Gilgamêş jinek ji surha keleha xwe ve avête newalê, lê gava bizanin tu çi jin bûyî, wê pesindarî û berxwedariya min bikin.”

Gilgamêş xwast nîşanekê bide gelê xwe, ku ew nema ji sihirbazan, pîrên pûtxaneyan an jî ji xudîkan ditirse, ewên ku wan ji xwe re bi terzekî fantaz pêdakirine, lew re roja dî fermanek derxist, da destê fermanxundê bajêr, deholkut jî bi wî re şandin, ewana di nav bajêr re geriyan û li her meydan û tratekê rawestiyan, dehol hatin lêdan û fermana Gilgamêş hate xwendin:

“- Bi fermana şahê navbilind Gilgamêş, divê hemî danîştvanên bajêr îro berî ro diçe ava li dora Dara Şeryar bicivin.”

Gelê bajêr matmayî ma, nizanî bû çi heye, lê her yekî/yekê li gor fantaziya mejiyê xwe tiştek got an li ser tiştekî hizirî. Bêtirê Urûkiyan guman kirin ku şahê wan Gilgamêş wê qurbaneke mezin bavêje ber marê ku dara Şeryar diparêze.

Gel ji her aliyekî ve civiya, bû pisepis di nav gişan de, zarok ji tirsa marê mezin bi dawên dayikên xwe ve zemirî bûn, tew nediwêrîn ber bi wî ve binêrin, û her car gava mar seriyê xwe yê mezin dilivand û zimanê xwe yê bi neçel dirêj dikir, her kesekî dikete gumanê ku mar dixwaze xwe bavêje ser wî, wê bi wî dade an jî wî birevîne û daqurtîne. Wan berê dîtibû, çewa ew berxik û karikan di devê xwe de winda dike.

Gilgamêş bi heyteholeke fermî ya şahanî hate wê meydanê, da her kesek bîne bîra xwe, ku ew şahê wan e, û ew çi bike, ew azad e, lê dîsa jî derketina li hember baweriyên di sîng û mejiyê gel de ne karekî asan e, her şahek newêre wê serhedê derbas bike.

Li gel Gilgamêş ê bi peyatî hat, serdeka "erebeya" şahanî jî li pey wî bû, ew serdek bi das û bivir û bêr û palteyan dagirtî bû.

Gel bêdeng bû. Gilgamêş hat di navbera wan û Dara Şeryar de rawestiya. Paş ku wî gelek pirs û tirs di çavên hemiyan de xwendin, got:

"- Urûkîno, hûn tev dizanin ku ez im yê çûye welatê Fînîqiya û parêzerê darên Erîzê kuştiye û kokên wê darê aniye..."

Di wê navê çavên wî li pûtê Enkîdo ketin, ku di ser maleke nizim re dixuya, û ji nişka ve rûyê pût berken bû, weku ew ne kevire, ew mirovekî jîndar e...

"-Divê ez ya rast bêjim, ez û dostê xwe Enkîdo bûn. Em herdu bûn, yên ku taneyê asîmanî avêtine erdê û kuştine... Hûn dizanin jî ez bûm, ewê di gola mirinê re, di çiyayên Mako û Godî re çûye, da çirîskek hişmendiyê ji Utnapîşto yê li ba Xwedê hilbijartiye bînim... Min gelek zorbazî berê kiribû, lê paş ku çavên min vebûn, ez hişyar bûm, û min biryara xwe da, ku ta roja dawî ji jîna xwe li gel ronahiyê dijî tariyê bixebitim, nehêlim kesek zorbaziyê li gelê Urûkê bike, şer û şeryaran ji we bi dûrxînim, nehêlim di vê civatê de ciyê mirovnehezan hebe."

Wilo got û dest avêt tîrkevana xwe, tîrek xist tîrkevanê, da ber rûyê xwe û ber bi mar kir, ku li bin Dara Şeryar seriyê xwe rakirî bû, û got:

"- Vaye ez we ji Dara Şeryar û ji marê hov azad dikim."

Şirpîniyek bi tîrkevana wî ket, û li gel hêlehêla mirovan tîr firiya, wekî birûskekê çû di devê marê hov de venişt, seriyê wî hejiya û rumpinî jê hat gava ew li erdê ketiye.

Mirov di nav tirsê de man, gelek reviyan, hema ewên bi Gilgamêş bawer bûn, bi ser marê mirî de beziyan û di nav hev de xurcilîn.

Gilgamêş gote wan:

"- Ho mêrêno, mêrên wêrek û wefadarên şahê xwe, rakin, bila her yek ji we bivirekî, dasekê, bêrekê an palteyekî rake, û bila em Dara Şeryar ji vê ortê hilkin."

Yekî got:

"- Gava Inana sihirbaz li me hişyar bibe, wê me tevan bike mîntik û meymûn."

Gilgamêş bi dengekî bilind keniya û got:

"- Min ew di bin basikê şevê de hinarte wêlwêl deresiyê."

Gilgamêş palteyek li pîkinekî Dara Şeryar xist, da giş bibînin ku çi xûn ji wê narije. Pîkinê darê ji jor ve hate xarê, mêran li çavêd hev nêriyan, tirsa wan piçekî belav bû, lê gava Gilgamêş gelek caran li koka darê daye û çi xûn jê nerijiye, hemî beziyan ser serdeka şahanî ya tijî pêkarên cihêcihê bû, her yekî dest avêt pêkarekî û hatin bi Gilgamêş re li dora Dara Şeryar civiyan û lê hatin hev, koka wê hêdî-hêdî birriyan, dara mezin û kevnare, ku bi mehan û salan tirsek giran xistibû hinavên mirovan hate xarê…

Yekî ji peyrewan gote Gilgamêş:

"- Şahê min î navbilind û dilwêrek, ma ez dikarim çermê vî marî bibim ji xwe re bifiroşim, an bikime çermê deholekê?"

Bi wê gotinê re yekser peyvên Utnapîştoyê pîr li ser deholê hatin bîra Gilgamêş. Wekî birûskek li wî bide, ew di cî de rawestiya û gote peyrewên xwe:

„- Başe, we dara hovane anî xarê… sibehî hûnê bên û wê ji reh û damaran ve rakêşînin, hûnê ji çermê marî û ji koka darê deholekê û gûmpalekî çêbikin û ji min re bînin."

Roja dî xort civiyan, rehên dara Şeryar ji zevînê kêşan, ji çermê marî û ji koka darê deholek çêkirin, bi rehên wê şidandin, û ji pîkinan gompalekî hêja amade kirin û anîn ji şahê xwe re.

Gilgamêş ew dehol bi histoyê kirîfekî xist û gotê:

"-Lêbide."

Bi lêdana pêşîn re hemî kesên li seraya wî bûn gêj bûn, wekî şêt û dînan bi ser hev de ketin. Gilgamêş got:

"- Bi lêdana vê deholê re wê hemî şeryarên ku neqenciyê dikin, gêj û dîn bibin, wê ji bajêrê Urûkê birevin, nema vedigerin tên."

Gilgamêş wilo got û di dilê xwe de got:

"-Ev bû dehola ku Utnapîşto qalê kiribû. Niha ez dizanim ku ez destvala ji ba wî venegeriyame…"

Di demeke kin û kurt de, Gilgamêş bajêrê xwe ji mêrkujan, diz û keleşan, malxur û zordaran paqij kir, bi lêdanên dehola kirîf re ewana gêj bûn, hêza wan nema, ew tirsiyan û ji Urûkê reviyan. Gelê Urûkê bi wê yekê dilşad bû, ji wan hovên ku xûna wî dimêtin rizgar bû, û bi taybet ewên, ku bi navê olê zordarî dikirin.

Paş pir sal û mehan, êdî Gilgamêş pîr bû, hestiyên wî jar û zer bûn, kabêd wî sist bûn û rohnî di çavan de vemirt. Pîr û pûtperest dîsa bi hêz bûn, û zorbaziya xwe bi navê olê li gelê Urûkê kirin…

Melekê mirinê xwe ji jor ve bi ser bajêrê Urûkê ve berda, dest avête qirka Gilgamêş, zora wî bir, canê wî stand, rakir li gel xwe di heft qatên asîmanê re firand, û bir ba dostê wî yê kevin, ba Enkîdo.

Efsane dibêje, ku Gilgamêş li wir jî bû padşahek, û Enkîdo bû destê wî yê rastê, lê belê li wir, baş û nebaş, qenc û ne qenc, xêrxaz û şeryar, tev ji hev hatine cihêkirin, yên hêja di behiştê de û yên nehêja di dûzexê de, ku di navbera wan de berzexek heye, tew nikan bên ba hev. Lew re jî pêwîstî bi zor û pevçûnê nîne, pêdiviya Gilgamêş û Enkîdo bi şûr ûmertalan, bi tîr û tîrkevanan, bi zirx û palteyan nema…

Teviya dema xwe bi keçikên sipehî û çeleng re di nav av û baxan de derbas dikirin, her tiştekê dixwestin li ber destên wan bû, gelek lawik û xulmanan berdestiya wan dikirin… êdî temenê mirov nediçû serî, herheyî û bê mirin…

DAWI